# Dîwanî Mamosta Qanē’e[*]

Kocher Bîrkar [Caucher Birkar][†]

January 26, 2003

**Abstract**

This is a new version of Diwani Qane’e written in Latin script.

## Contents

0.1 Tē heĺkēsh bo pēkenîn . . . . . 18
0.2 Rîshî pan . . . . . 18
0.3 Neĺey pashkewtūy . . . . . 19
0.4 Xakit be nirxe . . . . . 19

**1 Beshî R** **20**
1.1 Xatū sheytan le xewa . . . . . 20
1.2 Sūdî wiĺatim . . . . . 21
1.3 Diĺey xembar . . . . . 22
1.4 Tēheĺkēsh legel shē’erekanî h̄afizî shîrazî . . . . . 22
1.5 Milwēnkî girēy diĺ . . . . . 23
1.6 Legeĺ qeĺem . . . . . 23

**2 Beshî Z** **24**
2.1 destî cherx . . . . . 24

[*]This is not the last version, so it may contain errors.

[†]© 2002, This document is copyrighted and distribution, publication and copying without the author’s permission is prohibited unless for personal use. School of Mathematical Sciences, Nottingham University, Nottingham, UK.

**3 Beshî J** 25
3.1 Temen u Arezū 25

**4 Beshî S** 25
4.1 Eme ber le sheŕî yekem witrawe 25
4.2 Bangî agadarî 26
4.3 Nameyēk 26

**5 Beshî Sh** 27
5.1 Eger mirdim 27

**6 Beshî ’E** 28
6.1 Mey noshî 28

**7 Beshî Q** 28
7.1 Endēshe 28

**8 Beshî K** 29
8.1 Bextî aware 29

**9 Beshî L** 30
9.1 Gerd u xoĺ 30
9.2 Legeĺ dulber 30

**10 Beshî M** 31
10.1 Bîrî gencî 31
10.2 Ducharim 31
10.3 Penc xishtekî le ser shē’erî Bēkes 32
10.4 Shērezay Kurdim 33
10.5 Pēnc xishtekî 34
10.6 Xem be ba nadem 35
10.7 Bade noshî 36
10.8 Xerabatî 36
10.9 Derūn tarîkekan 37
10.10 Daxî diĺ 37
10.11 Pēnc xishtekî le ser shē’erî Miftî Pēncwēnî 39
10.12 ŕū, le mehweshan nek sade ŕuxan 40
10.13 Nekem chî bikem 42
10.14 Min u yar 42

10.15 Xakî weten . . . 43
10.16 Wesyetî dayik bo kich . . . 44
10.17 Kiŕuzanewe . . . 44
10.18 Berwarî mējūy Eh̄med Muxtar Caf . . . 45
10.19 Terkî ŕoh̄h u ser . . . 45
10.20 Tenasib celb eka ebro . . . 46
10.21 Heme zimankare . . . 46
10.22 Xeyaĺim waye . . . 47
10.23 Nazanim xom chîm . . . 47
10.24 Cergî biŕawim . . . 48
10.25 Bo cenabî . . . 49
10.26 Ah u naĺey derūn . . . 49
10.27 Toĺe sendin . . . 49

**11 Beshî N** **50**
11.1 Nazenîn . . . 50
11.2 Her sēkman . . . 51
11.3 Serbazî . . . 51
11.4 Legeĺ Zanîn . . . 52
11.5 Wesyetname . . . 54
11.6 Legeĺ bulbul . . . 55
11.7 Bo kichekan . . . 56
11.8 Qanē'e u kereky . . . 57
11.9 Lemewla chî bikem . . . 58
11.10 Shēranî mekteb . . . 59
11.11 Hejarî . . . 59

**12 Beshî W, O, U** **60**
12.1 Shē'erî tur . . . 60
12.2 Cergî buryan . . . 61
12.3 Tēheĺkēsh . . . 62
12.4 Lasayî kirdinewe . . . 62

**13 Shē'ere hemecorekanî** **62**
13.1 Maĺ besh kirdin legeĺ birakem . . . 62
13.2 Azîz hîlakim . . . 64
13.3 Min u nan . . . 64
13.4 Berî yekētî . . . 65

13.5 Reshbeĺek le cejnî ladēda . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 66
13.6 Hetîw le ŕojî cejna . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 69
13.7 Sikaĺay Nesrîn lay Qanē'e . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 70
13.8 Qanē'e u shwan . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 72
13.9 Jyanî kich . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 74
13.10 Dostî be umēd . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 75
13.11 Lay laye . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 76
13.12 Goranî shîwen . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 78
13.13 Ax bo temenî cwanî . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 79

**14 Serchawekan: 80**

# Pēshekî

This is a rewriting of Diwani Qane'e [Q] in Latin script. As far as I know that book has not been republished for quite a long time. The purpose of this rewriting is to present the book in a better form and introduce the poet to a wider range of readers. I have written this in TEXprogram which is much more powerful than usual text editors and can cope with Kurdish writing easily. I have added some words under the title of some poems, in order, to classify the content of the poems.

My main interest in this book is not really the art of poetry, but rather the ideas of the poet at the time of his life. He has tried to say some thing in his poems rather than just to create a string of nice words. He has been mainly concered with Kurdish nationalism, backwarded believes among people, the goverment, lack of knowledge and education, women's position and problems specially younger ones, animal's rights, sociology, history, ... What more interesting to me than others is his opinion on education and science. In many places in this book he has explicitly expressed what he means by science, "to make a better life" using technology, health service, a good education system,... Of course you can find these "beautiful" expressions in almost any Kurdish or non-Kurdish poet's writings, but the importance in this case is the strong emphasis of the poet, on these matters, through out his books. This shows his true belief in science (read the poem "legeĺ zanîn, in part N).
Of course, for us scientists, science is not just that little thing. But we should

not forget that in the level of society this may be the maximum you can expect. We believe also in the other way around, that is “life for science”. It means that science is well deserved to devote your life to it.

A big problem with this book is the time of the poems. The poems in the first half are sorted by the end letter of the first line regardless of the time when the post wrote the poem. The ideas of the poet have dramatically changed in different times. When he was a teenager or a bit older he seem to follow the tradational sort of poetry: love, religion, ... But later he criticises allmost any existing system like religion, feodalism, ... Though he seems to be muslim by religion but one can doubt when reading many of his poems written after his 20s (e.g. “paradise” poem).
Qanē’e writes in “Kurdish”. I mean he truely writes his ideas in pure Kurdish. **He lives with Kurds !**. Though some times he uses Arabic words but the grammar is Kurdish. This makes him unique.

You see him talking to a girl, a shepherd, a tree, a rock, his dog, his donkey, ... and expresses his ideas in this way.

As you know there is no universal standard Kurdish writting system for the moment, so I have not followed any one completely. Bellow is a table to explain the way I have used to write.

| | | |
|---|---|---|
| ē | like | shēr (=lion) |
| î | like | pîr (=old) |
| ū | like | sūr (=red) |
| e | like | ser (=head) |
| ĺ | like | diĺ (=heart) |
| ŕ | like | piŕ (=full) |
| h̄ | like | h̄eme (=Muhammad) |
| sh | like | shar (=city) |
| ch | like | chaw (=eye) |
| q | like | qanūn (=law) |
| ’e | like | shē’er (=poem) |

The last one is quite nonsense, but I do not know how to get rid of it. Some people say we should ignor this letter because it is Arabic not Kurdish.

On the other hand these letters have been used in Kurdish for centuries, how can you simply ignore them? For example the word “shē’er” (poem) becomes “shēr” (lion) if you do not put the letter “’e”, which means some thing quite different.

## Wēney sha'eir

wēnekem heĺbigre Kurde ba bibē bo yadigar
ba bimēnē yadigarim pashii xom bo ŕojigar
Kurde em serme , serēke piŕ le sewday nîshtiman
chawekanim , bo kizî Kurdane eshkî dēte xiwar
em demem her ew demes , hawarî hozim pē ekird
gwēm her ew duu gwēyeye eybîst seday giryan u zar
destekanim , her be ah u naĺewe emdan le yek
geh le tepĺî sermedan u , gahē sîney piŕ cexar
pencekem ew penceye katē ke pēnuusî egirt
shē'erî Kurdî pē enuusî , her le yek her ta hezar
diĺ her ew denkaĺe goshtes dayime piŕ buu le zuux
cergekem cheshnî kebabe , bo kizî Kurdî hejar
laqekanim heĺgirî lashey zebuun u piŕ xemim
ya be shwēn nana eŕoyî ya , le des dujmin fîrar
Qanē'ea em derdî serye her be tenya to nebuuy[0.1]
îshî her wa dax u derde , cherxî koney ŕojigar

* * *

**em chwarēne le ser goŕekey Qanē'e nuusrawe:**
nebuu ŕojē le Kurdistan serokē yaxu xemxwarē
hemîshe bo ebē Kurdan beĺa u nasorî lē barē
eger mirdim le ser qebrim binuusin to xwa yaran
shehîdî eshqî mîlet būy ke chî netdî pelamarē

## Witeyek le barey sha'eîrewe

Seretay werzî taĺî jyanî em sha'eîre le kotayi saĺekanî sedey nozdeyemewe , wata le saĺî 1898 zayîniyewe dest pē ekat .. Dway ewey derebegekanî nawchey Merîwan bawkî em sha'eîreyan aware kird u miĺk u maĺyan dagîr kirdin , be dem ew lē qewmawiyewe wekū minaĺî derbederēk le ŕojî 15 eylūlî heman saĺda

[0.1] le destnuusēkda nuusrawe: **Qanē'a em derdî serye chun le bo hozit bwe ..**

le awayî Rîshēn[0.2]le binarî Sharezūr , le dway chwarde xushk chawî be dnya heĺ hēna..
bew h̄aĺeshewe kiĺoĺî destî le yexey nekirdewe , le temenî 40 ŕojîda bawkî kochî dwayî ekat u taze pē ŕewke ebē daykîshî emrē , mamekanî nazî nakēshin ..
**Axo minaĺe derbederēk lew temeneda chon jya bē?**
tomarî jyanî em minaĺe meynet doste le zemîneyekî derbederî u piŕ le kiwēreweryewe destî pē kird , sherim nye eger biĺēyn ŕojan le naw mindaĺanda u shewan le sertenūran jyanî be ser ebird .. ta maweyek înca , be hoy xizmēkî dūryanewe ke nawî Ax̄a Seyid Hiseyn u xeĺkî dēy Choŕ bū le nawchey Merîwan pē enēte zemîney jyanēkî tirewe , nawbiraw eybate lay xoy u le h̄ucre eynēte er xwēndin , be pēy nerîtî feqēyetî ew ŕojgare le sūxteyiyewe dest pē ekat , ber lewey be tewawî fērî xwēndinewe u nūsîn bēt car u bar shē'erî serzenishtî da ena u her emesh bū be binchîney sha'eîrētî dwa ŕojî .. katî bē îshî xoy be xwēndinewey shē'er u babetî edebiyewe ebirde ser. Shē'er lew kateda shewcherey koŕî shewane u keresey ŕoshinbîr kirdinî cemawer ebē , boye emîsh yekēk ebē le sewdaserekanî bazaŕî shē'er .. ke chimkî agirî yekemîn sheŕî cîhanî geyishte nawchey Merîwan le ber ewey leyenî ayînî le sheŕekeda be hēz bū , zorbey ŕoshinbîre ayînîyekanî ew serdemey nawcheke ŕaste u xo tēkeĺî sheŕeke būn u xeĺkēkî zoryan legeĺ xoyan ŕapēchî naw sheŕeke kird .. bē ewey ke le îstîratîcyetî sheŕeke u layene syasiyekanî u nyazî împiryalîsm u mebestekanî bigen le sheŕekeda. Emîsh yekēk ebē lew komeĺe ŕoshinbîre ayîniyaney ew serdemey nawchekeyan u wekū yekēk lewan beshdarî sheŕe ekat .. layenî be ayîn boyax kirawî sheŕeke gelēk kar ekate ser ŕēbazî bîr kirdinewey , boye ew sereta shē'eryey ke le ser serzenishtkarî damezra bū be cē dēĺē u ŕū ekate shē'erî babetî ayînî u xwaperestî , her wekū lem nimūneyeda der ekewē:

ya Mihemed lēw be bar u diĺ be buryanim meke
ey ŕeyîsî her dū dinya , dîde giryanim meke
deste ejno u chaweŕēgey destî yaranim meke
min ke alî tom , zelîlî barî ?eisyanim meke
x̄eyrî qapî ŕe'fetit* , bo kes sena xwanim meke !

Ke shoŕishî oktoberî soshyalîstî be pēchewaney nyaz u arezūy împiryalîsm tay kēshî syasî encamî sheŕekey be bar u doxēkî ser be qazancî zorbey gelanî nawcheke kēshayewe , seretay bîr kirdineweyekî nwē le jyanî ŕoshinbîrî sha'eîrda serî heĺda .. dway ewe carēkî tir dest ekatewe be xwēndin , înca heway

[0.2] her chend le hendēk chapemenî serdemî jyanya wa nūsrawe ke le dēy (Kewĺos) le dayk bwe , beĺam ewe bo mebestēkî taybetî bwe

geŕan be naw sharekanî Kurdistanya ekewēte ser bo xwēndin Sine u Sabĺax u Shino u Hewlēr u Koye u Kerkūk u Silēmanî u Byare geŕawe[0.3] , dwa qonax̄î xwēndinî dēnētewe Merîwan u înca be yekcarî destî lē haĺ egirē ..
Le seretay lawîda nexoshî tenge nefesî (Asthma) ebē u ta dēt lēy zyad eka , le encamda her bew azaresh serî nayewe.
Ew nakokye xēĺeyaney nēwan bine maĺey sha'eîr u derebegekanî nawchey Merîwan , makēkî le bîr nechūnewey le derūnî sha'eîrda xuĺqand , ŕoj le dway ŕoj le naw cim u cūĺî fîkrî sha'eîrda zyadî ekird .. eme le layek , le seretay bîstekanîsh be dwawe ke naw be naw hewaĺî peywendî syasyaney tund u toĺ u harîkarî nēwan koŕ u komeĺ u taqime syasyekanî ew serdemey Kurdistanî Turkya u Kemaliyekan egeysht bē aramî xoshî sha'eîrî da egirt .. dîsanewe le layekî tirîshewe serkewtinî shoŕishe mezinekey oktober u seretay biĺaw būnewey bîr u baweŕî pēshkewtin xwazaney dij be fashîsm le naw twēj u komeĺe xwēndewarekana , emane hemū zemîneyekî nîshtiman perwerane u netewayetyan xuĺqandibū , we pashgez būnewey Kemaliyekan beramer meseley Kurd u berpa būnî shoŕishe naw be naw pishŕaw u yek le dway yekekanî Kurdistanî Turkya (Agirî Dax) bîr u baweŕî zorbey lawe xwēndewarekanî xiste ber mewdayekî netewayetî u nîshtimanyaney kariger ..
Wa ŕēkewt bîr u baweŕî netewayetî lew nawcheyeda ke pashkoy nawche pēshkewtwekanî Kurdistan bū kewte pēsh biĺaw būnewey mewday firawanî bîr u baweŕî soshyalîstî , we emesh zortir be hoy hendēk pyawe be naw ayînyekanewe bū ke piŕupagendey endēshawyan le dijî yek girtinî gelan u ŕēbazî nēw neteweyî biĺaw ekirdewe. We her weha piŕupagendey herewezî dar u destey împiryalîsm u koneperestanî naw xo u giranî barî meseleke xoy le xoyda mawey eweyan neda bîrî soshyalîstyane be firawanî berew pēshtir bikewē .. beĺam meseley netewayetî le bwarî syasî ew ŕojeda bū be hewēnî hemū parche nūsîn u qise u basēkî nîshtimanyane. Sha'eîr u ŕoshinbîr u mela u feqē u xwēndeware u pēshkewtwekan hezyan le bas kirdin u gēŕanewey beserhatî sheŕ u shoŕ u serkewtin be ser berey împiryalîsmyanda ekird .. lem kateda ke seretay sha'eîrētî sha'eîr bū zor be gurcî barî serinc u shēwey naweŕokî shē'erekanî le diĺdarî u ayînyewe goŕdira bo nîshtiman perwerētî .. wekū xoy chend carēk basî kirdiwē u le pēshekî dîwane shē'erekanî serdemî xoya u le chend layekî tirîshewe lēy dwawe kitēbēkî destnūsî Farsî be nawî Weqayē'e Alē Erdeĺan dest ekewē ke basî ŕapeŕinekanî tîrey Erdeĺanyakan ekat beramber be dagîrkaran , eme ewendey tir kar ekate ser dîwî nawewey derūnî sha'eîr u berheme shē'eryekanî .. lēreda be tewawî qonax̄î shē'erî diĺdarî be cē dēĺē ke

[0.3] le hendēk lem shwēnaneda kemtir le mangēk we yan chend ŕojēk mawetewe

eme nimūneyekî shē'erî ew serdemeyetî:
Meseh̄ ger bēte ser qebrim bixwēnē pēy eĺēm : lacho
diĺim pēkrawî tîrî x̄emze u peykanî mujgane
eger to noberey machēkî kēwî xot be min bexshî
me'eabid chon ekem bîla , echim bo kuncî meyxane

weyan : dîdem newnemam , dîdem newnemam
dîde ŕastekem , baĺa newnemam
bchî napirsî le h̄aĺî xuĺam
heta qyamet min her be temam
diĺey nazdarit le chî ŕencawe ?
germe meylekey ew sat nemawe ?
meylit bo sarde be qisey bedgo
be qisey ŕeqîb memke ŕenceŕo ?

Sha'eîr dway ew qonax̄e ebēte sha'eîrēkî netewayetî u nîshtiman perwer , le bwarî netewayetî u nîshtimanyaneda be cergane eĺē:
ey weten ! xo min be na h̄eq ser kiz u aware nîm
ŕoĺekey xotim be pakî dujmin u xwēnxware nîm
chunke ŕoĺey Kurdistanim , weh̄shî u petyare nîm
wa mezane ! kewte ŕojî xoy , weha bēkare nîm
seyrî mex̄zî dujminit ke , tēkeĺî xwēnawime

yan witūyetî:
qurbanî em xakeye , em ŕoh̄e le berma
sozî diĺî piŕ derde , ke xolyaye le serma
amadeyî meydanim u em berge ke poshîm
kifne , ne wekū chaket u pantoĺe le berma

Her le seretay syekanewe ta kotayî dyardeyekî netewayetyaney be cerg le naw shē'erekanî sha'eîrda serî heĺda u cēgay xoy kirdewe ?
biĺaw kirdinewey bîr u baweŕî soshyalîstyane le layen kar be destanî h̄ukmî ew serdemewe ber best kira bū , beĺam ewendey le keleberî nēwan dezgakanî polîsewe ehate naw komeĺanî xeĺkewe sūdî lē wer egîra u xeĺkî zor lē kiraw u chewsawey agadar ekirdewe , lew kateda bas u beserhatî shoŕishî oktoberî soshyalîstî u amanc u layene syasî u komeĺayetî u abūrî u netewayetyekanî be zorî le ser zarekî bas ekra , emesh zemîneyekî way xuĺqandibū ke her take shitēk be chend corēkî cya le yek lēk bidrēnewe beĺam be shēwey gishtî

wekū meseleyekî syasî zîndū xeĺkî basyan ekird u be pîryewe echūn .. em chwarîne shē'erey xwarewe nimūney seretay hest kirdinî sha'eîre be be ŕijēmî soshyalîstî : we sha'eîr le shē'erekanya pēsh pēwîstyekanî serdemî xoy kewtwe bem core daway yeksanî kirdwe:

ba sē qat nebē xan u seraket
parey qatēkyan bide be biraket
dewĺemend meĺē hewĺî bo xoye
nebūnî hejar , nebūnî toye ..

Natwanîn qonax̄ekanî babetî shē'erî sha'eîr le siyekana be wirdî dest nîshan bikeyn .. tenya eweye lew maweyeda shē'erî heme babetî witwe .. diĺdarî , nîshtimanî , komeĺayetî , netewayetî .. her wekū le bwarî komeĺayetîda witūye:

pirch u bermaĺ u sîwak u ŕîsh u keshkoĺ u eba*
bo swaĺin , key eme espabî jîn u h̄urmete

weyan witwētî:

destî merdî tund le eĺqey kasibî meh̄kem bike
polē naka hîmetî Pîrshalyar u Koneposh[0.4]

Be hoy dwemîn sheŕî cîhangîryewe bîr u baweŕî pēshkewtwane le wiĺatda perey send u em pere sendinesh bwe hoy zyatir handanî sha'eîr le dijî rijēmî derebegayetî u kolonyalîsim .. wekū witman ew nakokye xēĺekyaney nēwan sha'eîr u chend derebegēk goŕaye ser shēwey kēsheyekî syasî dij be tēkŕay ŕijîmekey .. her chend mewday bîr kirdinewey le kēshey nēwan xawen miĺk u ŕe'eyetekan qūĺtir bwayetewe ewende heĺwēstî beramber tēkŕay derebegayetî tundtir ebū , lem qonax̄eda sha'eîr tēkeĺ be edebî shoŕishî nihēnî bū , cemserî fîkrî be edebî shoŕishgēŕanewe coshî xward wekū witūyetî:

kakî malik pēm biĺē bochî eme ayînite
xwēn mijînî jēr desey bē deseĺatan dînite
yek qiroshit da be ŕic'eî Turk u[0.5] tapot girte des
ta qyamet ew qiroshe mayey jînite

Le ber ewey komeĺgay Kurdewarî ew serdeme komeĺgayekî ayînî u derebegayetî bwe , sirūshtî komeĺgakeman le wiĺatēkî pîshesazî nechwe ke deseĺatî

[0.4]dū ŕaberî ayînî be naw bangin .. le Hewraman u nawchey Shilērda būn

[0.5]le wiĺatî ēmeda tapoy zewî u zar le Usmanyekanewe dahat ke koneperestî Turkya serperishtî ekird .. boye shē'erekanî legeĺ doxi syasî serdemda edwē

sermayedaran xeĺikyan chewsandibētewe boye shē'erekanî be zorî legeĺ cūtyaranda edwē u berheĺistî derebegekan ekat.
Wekū witman le sertapay syekana shē'erekanî sha'eîr be zorî le naw kewanēkî netewayetyane u nîshtimanîda esūŕayewe .. xoshewîstî bo xak u gelekey le zorbey shē'erekanî ew serdemeya xoy enwēnē .. layene le yek nechwekanî shē'erekanî sha'eîr ewe egeyenē ke zadey fikrî yek serdem u pēwîstî yek qonax̄ u berhemî yek ēsh u azar nîn .. we zorbey shē'erekanî em qonax̄ey ŕwaĺetî cherxēkî edebî nwēy piŕ le syaset îshan eda.
Sha'eîr baweŕî be yek girtinî cemawer u ser kewtinî ŕijîmî soshyalîstî bwe , boye bem core ŕu ekatewe derebeg u hewaĺî shoŕishî nihēnî eda be gwēyda u eĺē:
gwē gire qanūnî soshyalîstî dengî dayewe
ŕojî mergit zor nizîke ew denge yasînite
noker u pēsh xizmet u kareker u dayaneket
kewte ŕojî xoy bizane dujminî xwēnînite
baxē hēnde qayim u meh̄kem nebūy min netgemē
destî îstî'emare hēz u komek u perjînite

Sha'eîr derebegayetî ? wekū chînēk ? be dujminî serbestî gel u pashkewanî dagîrker zanîwe , beĺam be shēwey take kes peywendî dostane u ŕaz u nyazî legeĺ gelēk derebeg u xawen miĺkda hebwe.
Le seretay chilekanewe ? be taybetî le ŕojgarî dwemîn sheŕî cîhanîda ? ŕēbazî soshyalîstî wekū dyardeyekî syasî zîndū le naw shē'erekanî sha'eîrda derkewt u serî heĺ , beĺam sha'eîr bew shēwe sakaryey ke zorbey ŕoshinbîranî ew serdeme ? we taybetî ladē nishînekan ? lēy tēgeyishtbūn , mameĺey legeĺ meseley soshyalîstîda ekird u we be pēy h̄ukmî tēgeyishtinî le meseleke ? nek bew mana u mefhūme firawane gishtyey emŕo le aradaye ? le naw koŕ u komeĺe ladē nishînekana ser be xo basî ekird .. we lem ŕwewe shē'erekanî ew zorbeyan legeĺ cūtyar u kirēkar u shwankare u tewawî ladē nishînekana bē pēch u pena edwē u peywendyekî ŕîshedarî be naxî jyan u barî komeĺayetî ew serdemey gelî Kurdewe heye , boye ke daway yek girtinî kirdūn we em shē'eraney te'ebîr le jyanî xoy u komeĺekey u pēwîstî yek girtinyan ekat:
yek girin ey chînî cūtyar yek girin
yek girin ŕoĺey kirēkar yek girin ..
Sha'eîr lew baweŕeda bwe ke le wiĺatēkî fire neteweda mumkin nabē hemū netewekanî naw chwarchēwey ew wiĺate wek yek bijîn u le ŕuy yasay komeĺayetyewe yeksan bin u abūrî wiĺat be abūrî hemū netewekan wekū yek bidrēte qeĺem u wekū yek serbestî syasyan bidrētē , boye hemîshe le heĺwēstî syasyaney

netewe serekyekanî ew core wiĺatane siĺemîwetewe u le shē'erekanya emey be ladē nishînekan geyandwe .. le shē'erekanya tawanî jēr kewtinî hemū ŕapeŕinekanî netewey Kurdî xistwete estoy kone perestî naw xo u serkirdayetî xēĺekyane yan take kesî u berey împiryalîsim , we împiryalîsimî hemîshe be dujminî ŕapeŕînî gelan danawe .. ŕapeŕînekanî Kurdî hergîz be ŕapeŕîn le dijî netewekanî dirawsē danenawe beĺkū be dijî ew ŕijēmaney danawe ke h̄ukimyan tya kirdūn u būnete dar destî împiryalîsim .. le barey ayînewe be shēwey gishtî xwa perest bwe (înca bew mefhūme firawaney ke bas ekirē yan ne ??) , beĺam hendēk heĺwēstî ayînî le wiĺatda be beshēk le keresey dest be ser fîkrî azadî xwazaneda girtin da ena .. her le ber emesh bwe h̄ezî le melayetî kirdin nekirdwe , her wekū lem shē'ereda der ekewē:

le ber pestî gelî Kurde , ke wa bēgane zawame
le ser em hoze chen saĺe be tenya hewiĺ u dawame
be xoŕayî le destî da sefay em zeyd u mawame
melayî u xwēndewarî ŕewishtî xom u bawame
beĺam , min arezūy nan u jyanî wek mela nakem ..

Hatine pēshewey bazaŕî dwemîn sheŕî cîhanî ? wekū basman kird ? naweŕokēkî nwēy xiste naw shē'erekanî sha'eîrewe , sha'eîr wekū zorbey ŕoshin fîkrekanî hawcherxî lew baweŕeda bwe , ke dway kotayî sheŕeke be qazancî berey gelan u le nawchūnî deseĺatî Eĺmanyay Hîtlerî u Nazîgerî le cîhana meseley netewe jēr destekan be layeka exirē u Kurdîsh wekū lew gele jēr destane be awatî ŕizgarî xoy egat .. her wekū lem shē'ereda awat u chaweŕēyî sha'eîr der ekewē:

Kurde were binwaŕe deway derdit le kweye
her peŕewî Lenîne , dewaw u charî nexoshîn
nabî be ker u ebdî* hemū begler u tuccaŕ
lord nabē be baxat u , geda nabē be perjîn
maĺ u ser u ŕoh̄im be fîday agirî sūre
ew agire piŕ coshe eka ŕecmî sheyatîn
chen xoshe ke ew ŕoje biĺēsey giŕî agir
wek berqî x̄ezeb dēt u dechē lerewe ta Chîn
toĺey min u to wer egirē Kurde le Cherchîl
ew ŕoje ke wa xetmî eka shoŕishî Berlîn ..

Beĺam be pēchewanewe hatedî , berey gelanîsh ser kewt ke chî tund u tîjî syasî dijwar le wiĺatî Kurdewarîda le caran xiraptir mayewe.
Le zorbey shē'erekanya daway heĺtekandinî ew peywendye komeĺayetyaney kirdwe ke le derewey wiĺatewe hēnrawin .. we lew baweŕeda bwe ke tenya nerîte komeĺayetye ŕesenekanî naw xo etwanin xizmetî qazanc u deskewtî

netewayetî zorbey xeĺkî Kurdistan biken , hanî pîshe karekanî dawe ke be hēzî berhem hēnan ŕē le bazaŕ u bwarî berhem hēnan u dest be sera girtinî bazirganētî bēgane bigrin .. biŕway be meseley xēĺekyane u eshîretgerî* nebwe u daway le xeĺik kirdwe lēy dūr bikewnewe , her wekū lem shē'ereda be dyare:
bînēne goŕî tarewe ŕisūmî eshîretî*
ferqî mexen le beynî x̄enîda heta mizor
We le barey meseley afretewe eweney boy kira bē u twanîbētî le koŕ u komeĺekana basî serbestî afretî kirdwe u daway le naw birdinî dyardey ew binchîne komeĺayetyaney kirdwe ke afretî Kurdewarî pabendî pashmawey ŕijēmî derebegayetî le naw chū maĺe bawan kirdwe we char nekirdinî gîr u giriftî afretî Kurdewarî le ŕuy ŕoshinbîrî u komeĺayetî u abūryewe be nîshaneyekî tirsinak danawe le ber dem ŕebazî ŕapeŕinî hawcherxaney tēkŕay komeĺda .. we daway kirdwe ke afret le hemū bar u doxēkda le ŕuy tyorî u kar kirdin (piraktîk) u mafewe serbest bikrē bo ewey goŕanēkî ŕîsheyî le naxî komeĺda berpa bēt .. dwa xistin u be dwa kewtuyî manewey afretî be ŕēbazēkî zyan bexshane u pēchewaney bîr u baweŕî shoŕishgeŕane u dijî dîmukratyane danawe .. le naweŕokî shē'erekanya em wēnane der ekewin .. zewî be miĺkî cutyar zanîwe , kargesh hînî ew keseye karî tya ekat .. her wekū witūye :
qezay ew tozî gagērey sepane
le dū sed qesir u koshkî mîr u xanan
qezay ew dase ewsawî ke tîj bē
le dū sed biŕnewî deskarî Eĺman

weyan witūye:

werin karîgeranim her wekū shēr
derî bēnin xezîney lordî sharan
be mîzanî edalet* besh beshî ken
chi ferqēkî nebē salar u gawan ..
bijî ew bîre tîje emye dana
ke ŕuxanî qeĺay Fîrewn* u Haman

Wekū witman nakokî nēwan sha'eîr u derebegayetî le xaĺēkî bichūkewe destî pē kird , biĺaw būnewey bîr u baweŕî pēshkewtwanesh ewendey tir meselekey tîj kirdewe ta geyishte ew ŕadey be sha'eîrēkî dijî chînî derebeg u ŕijēmî derebegayetî nasra .. h̄ezî le xwēndewarî kirdwe u chend kesēkî le jyanya fērî nūsîn u xwēndinewe kirdwe cige lew qutabyaney ke dersî pē witūn ..

Seranserî chilekan be serdemî destēwerdanî syasî u serheĺdanî dyardeyekî nwēy shoŕishgēŕane u ŕēbazî soshyalîstyaney shē'erekanî da enirē .. sha'eîr ŕēbazî soshyalîstî be binchîney chareser kirdinî hemū gîr u girifte neteweyî u komeĺayetî u abūryekanî komeĺ danawe .. boye witūye:
heĺgirin pach u chek u bēĺ u qeĺem
her le ŕoshinbîr heta shwan u sepan
heĺtekēnin em nîzame bogene
dabiŕējin koshkî yeksanî jyan
ew demesh ŕoĺey pirolîtarî Kurd
debine ŕaber bo wiĺatî Kurdistan

Ew kēshe netewayetyey ke sha'eîr biŕway pē bū , wekū felsefeyekî bunyadnerane seyrî ekird u be h̄etmyetî qonax̄ēkî fîkrî da ena boye witūye:
amadeyî meydanim u em berge ke poshîm
kifne , ne wekū chaket u pantoĺe le berma ..

Chend carēk le ser îsh u karî dewĺet labirawe , beshdarî komarî Mehabadî kirdwe , lewēwe parche shē'erēkî bē nuxtey be name bo xwa lē xosh bū Fayeq Bēkes î dostî nardwe ke le seretakeya eĺē:
kake , selamim le haw diĺdarim
le mam u kes u gewre u serdarim
elh̄emd u lîla aĺa heĺkira
mawey derdî diĺ , emŕoke dira

We bem core .. le seretay pencakana destî kird be chap kirdinî hendēk le shē'erekanî be harîkarî chend dostēk lewane: mamostayan Eladîn Secadî u Shukur Mustefa u Kak Birayim nawēk u ? twanî pēnc bend le shē'erekanî be shēwey dîwanî cya cya u qewarey taybetî chap bika , wekū : Guĺaĺey Meriwan , Baxchey Kurdistan , Chwar Baxî Pēncwēn , Shaxî Hewraman , Deshtî Germyan.. ŕuy le zor xawen pare na ke yarmetî chap kirdinî pashmawey shē'er u nūsînekanî tirî biden beĺam be daxewe kes yarmetî neda .. le jyanya nefis berz bwe u her le ser ew nefis berzyesh bwe ke zū zū le ser îsh u kar labirawe .. le jyanya mamostay qutabxaney ŕesmî u kirēkarî u melayî u cūtyarî u ashewanî u fermanberētî bichūk u wirdewaĺe firoshî kirdwe , beĺam le hemūyan zortir ashewan bwe .. le dēy Caferan u Sē u Sē Nanî Qeredax u Daroxanî nawchey Shilērî ser be qezay Pencwēn mamostay qutabxane bwe .. le Sūrdash u Heĺebce katib bwe le dayerey temwînda . le nawchey Qeĺachwalan u Milkewe u awayiyekanî Pishte u shemēran u Der-

bendîxan u Sengeser kirēkarî dayerey eshx̄al u kisht u kaĺ bwe , le binarî Sharezūr qoĺchî daristan u le Kewĺos u Serkan u Naĺparēz ashewan bwe .. le Sharezūr u nawchey Merîwan naw be naw melayetî kirdwe , le Silēmanî u Sîtek u Banîbinok u Seyid Sadiq u Nizare u Shîwe Giwēzanî Shilēr dersî Kurdî u ayînî le qutabxane ŕesmyekana witwetewe ..
Binemaĺekeyan binemaĺeyekî ayînî u deseĺatdarî mam nawendî bwe u bab u bapîrî îrshadyan kirdwe , beĺam seretay jyanî em u kotayî deseĺatî binemaĺekeyan yekangîr bwe .. bawkî le sadatî (Kabil)î Merîwan u daykî le shēxekanî Kewĺos bwe le binarî Sharezūr.
Le seretay syekan be dwawe shē'erekanî sha'eîr wekū pēsh ŕewēkî edebî shan be shanî ŕîzî pēshewey bizūtnewey nîshtimanî Kurd ŕoyshtwe .. le naweŕastî pencakana le nūsîn u shē'er danan sard bowe , le kotayî pencakana chend car tūshî aĺozî u naŕeh̄etî bwe , lewane be h̄epsî birdūyane bo bendîxaney Besre u lewēwe bo Emare u hēnawyanetewe bo Bex̄da ..
Le saĺi 1960 da maĺî le Silēmanî u le bendîxaney Silēmanî waney Kurdî nūsîn be bendekan eĺētewe , le seretay shestekan be dwawe tūshî diĺ shikawî u azarî derūn ebē u echē bo nawchey Shilēr le qezay Pēncwēn .. le seretay saĺî 1963 da be hoy barî aĺozî nawchekewe legeĺ danîshtwanî chend dēyekda ŕew eken u echine ew ber sinūrewe , her ew shewe lew ber sinūrewe eygirin u legeĺ (Wirya)y kuŕî eyanben bo bendîxaney Qecer le Taran u maweyek le bendîxane eyanhēĺinewe , le katî ew bendyeda nexoshyekey zorî bo dēnē u hîwa biŕawî jyan ebē u bem core basî bendîxanekey ekat:
axirîn maĺî jyanim kuncî bendîxaneye
em kelebche merhemî zamî diĺî dēwaneye
būkî azadîm ewē , xwēnim xenes bo dest u pēy
eĺqe eĺqey pēwenim , wek piĺpiĺe u lerzaneye
gerchî dujmin wa ezanē min be dîlî laĺ ebim
bash bizanē ! kuncî zîndanim qutabî xaneye
girtin u lēdan u kushtin ?eamîlî azadye
top u shestîr u kelepche lam wekū efsaneye
bîrî azadîm le zîndana firawantir ebē
quŕ be ser ew dujmine , hîway be bendîxaneye
ger be azadî nejîm mirdin xeĺate bo leshim
nokerî u ser danewandin karî na merdaneye
chaweŕwanî shoŕishēkim ?ealemēk ŕizgar bika
mîletim bo ew mebeste kirdewey shēraneye
chekî shoŕishgēŕî min nūsîn u bîr u baweŕe
ŕapeŕîne , helmete , piŕ ne'eretey Kurdaneye

(Qanē'e)im emŕo le zîndana be azadî ejîm
sed hezar leh̄net lewey wa nokerî bēganeye ..

Ke le bendîxaney Qecer berel̍a kira egeŕētewe bo naw ew bare al̍ozey tyaya derbaz bibū .. carēkî tir dētewe nawchey Pēncwēn u le seretay beharî sal̍î 1965 da be mal̍ewe le dēy Lengedē le nawchey Shilēr nîshtecē ebē , we her be heman nexoshî le 7/5/1965 da le temenî 67 sal̍îda be dem goshe gîryewe kochî dwayî ekat .. termekey le goŕistanî shēx Ew Reh̄man ke goŕistanēkî bichūke u kewtote berî ŕojaway dēy naw biraw nējrawe .. le ser sē parche berdî meŕmeŕ kurteyekî mējūy jyanî u em chwarēne shē'erey xoy le ser nūsrawe:
nebū ŕojē le Kurdistan serokē yaxu xemxwarē
hemîshe bo ebē Kurdan bel̍a u nasorî lē barē
eger mirdim le ser qebrim binūsin to xwa yaran
shehîdî îshqî mîlet būy , ke chî netdî pelamarē

**Burhan Qanē'e** 1979

## 0.1 Tē heĺkēsh bo pēkenîn

seyrî menceĺ ken chilon piŕye le chēsht
xak ber ser kon x̄emē eyamra
sed tifim lēken le ser yaprax u gosht
ma nemîxahîm neng u nam ra
diwēnē dergay metbexim lē daxira
xak ber ser nefsē bedforcam ra
agirî loqentechî bū, aferîn
suxt în efsordeganē xam ra
x̄eyrî h̄eĺwa tamî dem shîrîn eka
kes nemîbînem zē xas o ?eam ra
diwēnē yek gîpem le gîpexane dî
kēz dēlem yekbarē bord aram ra
chon fîday bacî Mecēy chēshtker nebē
her kē dîd an ser u sîm endam ra
Qanē'ea , ba, îste bē nanî beĺam
?eaqēbet rūzî biyabî kam ra

## 0.2 Rîshî pan

bē qeza bē, mame sofî .. ta bē ŕîshî pan eka
?qul? be fil h̄alî bwe, chî îdî'eay wîjdan eka ?
xeĺkî geyiye celbî ŕoh̄ u, ew xerîkî shaneye
h̄ez le tezbēh̄î giĺîn u, xiŕnūk u qezwan eka
wa dirawsē keshfî mang u ŕoj eken, ēmesh shukur
kake derwēsh wa xerîke , keshfî doĺey nan eka
mamosakanman eĺēn zor sunnete swarî be ker
her kesē swarî be ford ka, xoy sherîk sheytan eka
ew be teyarey nefase tey eka ŕēgey wiĺat
em be swarî ker xeyaĺî Suriye u Lubnan eka
kafire segbabekan key sinete* telsiz eken
h̄emd u lîla Kurdî ēme quĺine u teyman eka
Qanē'ea bē sūde, ya shēx dujminî pēsh kewtine
Hosh u bîr u yekyetî , derdî wiĺat derman eka

## 0.3 Neĺey pashkewtūy

to neĺey pashkewtūy , ey Kurdekey nakamyab
qet be sūkî tē mefikrē , maĺ wēraney diĺ xirab
takū min būm, Rostemim bū, ŕojî h̄emle u keshmekesh
serkizî gurzî giranî būn, hezar Efrasyab
ew meqam u nezme min būm , kē le shenî* heĺ esa ?
her le Nuh̄ o des be des , ta hate dewrey înqîlab
maceray Kawem beyan kem , berdî ŕeq etiwētewe
chî be ser xakî ecem hēna , le shor u îztîrab
ya Kerîm xanim chilon bū ! min neĺēm to xot biĺē !!
chon le xakî Farsekana , kewte ser qehir u îtab
(Yezdîcurd)im , yezdî Kurdane , ebē chon win bibē
kē hetawî bo esharēto le jēr perdey nîqab ?
Qanē'ea basē le h̄aĺî Gîw u Goderzim bike ..
Ta le daxa diĺ be carē nebwete lūley kebab

## 0.4 Xakit be nirxe

Kurde wesfî Kurdistanit , xoshtire ta sed kîtab
syachemane xoshtire bo to heta cheng u ŕubab
shoŕishî qelbit bibē u gwē ŕagirî bi dengî ney
cergî bedgoy Kurdistanit , heĺ eqirchē wek kebab
dengî shimshaĺ u xiroshî def , bigate her diĺē
h̄asiĺî (keshf-ul-qobūr)e , ŕoshine zumrey ezab
aferem bo to weten , wa xak u xoĺit gewhere
x̄eyre meh̄sūre te'eamit , zor u bē h̄ed u h̄îsab
min le dinya da hewarim (Maĺe gewre) u (Shēre)[0.6] bē
ŕojî meh̄sher chatirim bo defter u name u kîtab
mamosakanman eĺēn: dinya nimūney axire
tē bifikrē xot ezanî kēye h̄azir bo ezab
sabitit kird Qanē'ea Kurdan le gisht kes chatirin
mijde bē bo Kurdekanî , herzekaranî shebab

[0.6] dū hewargey hawîne hewarîn le nawchey Shilēr le Pēncwēn.

# 1 Beshî R

## 1.1 Xatū sheytan le xewa

emshew ke bextim hate ser, shîrîn cemaĺē wek qemer
fincanî mem, qed neysheker, **pirsî le wez'eî min xeber**
hat zū be zū kirdî selam, baĺa nemamî xosh kelam
witim, eleykum u selam, **ey dulberî shîrîn siyer**
h̄orît weya cin u perî? serwî weya neyshekerî
hēnde ezanim dilberî ! **baĺa be cheshnî lîlupeŕ**
to, sosenî ya deste guĺ? ya darî mēxek u simiĺ?
ŕēget x̄eĺet kird? ya be diĺ, **hatîte lay dēwane ser**
chakî chilonî giyanekem? shewqî diĺî buryanekem
baxî guĺ u ŕeh̄anekem, **chon bū ke hatîte semer?**
fermūy: x̄erîbî diĺ be xem, bē maĺ u miĺk u bē direm
ger bēme ser barî kerem, **bē ferqe xak weya guher**
heĺsam, le bo îkramî ew, bo afetî în'eamî ew
minîsh kirdim selaî ew, **ŕiwanîm le pēy ta tewqî ser**
diĺim be tirs u shermewe, derūn be ahî germewe
chawim le tewqî sermewe, **pēm na le îshî piŕ xeter**
ke desti xiste ser milî, gūshîm dū la ŕanî shilî
gestim dū chawî piŕ kilî, **wext bū ke ŕohim bēte der**
be nazewe lēm hate deng, meke u lacho lēm kewte ceng
ŕiwanîm ke ew goŕa le ŕeng, **wek padishahî tacîwer**
fermūy: de la, ey bē h̄eya, ne shēxî shēx bî ya mela
ne zahidî, ne eshqiya, **ne sha'eîrēkî piŕ huner**
ne ŕendî, ne qelenderî, ne Farsî, ne Berberî
Kurdēkî piŕ derdî serî, **bē qîmetî wek tūrî teŕ**
kone feqēy maĺangeŕî, lar u dirēj u bē feŕî
key hawdemî sewĺî teŕî? **hoshit le kiwēye bē xeber?**
witim: xanim le ŕey xiwa, ŕeh̄mē bifermū bo geda
to padisha min bē newa, **besye îtir naz u keder**
zanî ke min shētî ewim, danîsht le ser cēgey shewim
h̄eramî kird xurd u xewim, **min shem u ew cheshnî fener**
damkend shewaĺî guĺzeŕî, derkewt sirînî meŕmeŕî
zahîr bū xezney piŕ duŕî, **hey hey! chi gencē kewte der?**
hestaye pē h̄eytey zelam, lew meqsedey kirdî selam
tēkeĺ be yektir būn temam, **wek xencer u kalanî zeŕ**

ew kiwēre marey seg deme, hēnde le xoy xatir ceme
etwit be morî meh̄keme, **boy nūsrawe bē shoŕ u sheŕ**
wek gurzî destî lendehūr, tawē le der, tawē le jūr
diŕî perdey guĺbaxî sūr, **kirdî be shîwen u chemer**
katē ke hestam lem xewe, ŕiwanîm ke hēshta her shewe
kirdim le boy shîn u kewe, **quŕim pēwa ta tewqî ser ..**
Qanē'e to tenya u piŕ xemî, bē eshret* u bē hawdemî
Sed ka ziyad bē her kemî, **kota ke basî bē semer**

## 1.2 Sūdî wiĺatim

sūdî xakî Kurdisanim chen hezaran der hezar [1.1]
bot binūsim kakî Kurdim, mîweyekî bē shumar
tūtin u genim u birinc u herzin u zeŕat u co
genmeshamî u dēmîle, hem daŕūcan u giske shar
basix u narinc u lēmo, pirteqaĺu hem tirē
kaĺek u shūtî u tirozî kūleke u sewze xeyar
choner u siĺq u shiwît u bamiye u kuncî u pemū
shēlim u mash u temate, baycan u kalyar
nok u nîsk u peŕshe u paqle u petate u lobya
sēw u hermē, qox u qeysî, gwēz u kishmîsh u henar
kahū u pyaz u kelerm u terson u bin erzîle
kashme u koĺ u binaw u, sur heĺaĺî la nizar
mēw u sincu u , kēkif u jaĺe u gizîchar u shehēn
goyij u chwale u beŕū , peĺk u baĺaĺūk u chinar
darî bî, pēnc tayafen, lazim nye nawyan bibem
xawenî sî u no berî xawen ŕewace mazūdar
gizgil u xiŕnūk u mazū, panke u sîchke u keĺinc
poze xūge u hemze ax̄a, hewr birdu u shaxdar
ber geĺa u tisqil u sewzaĺî u nîske u girē
karig u qijge u demūke, sēfe ĺūkey awdar
cewt u shoke, zoĺek u shînke u beŕū hejg u geĺa
hem gezo u zuxaĺ u pîfū, chaktrînyan bare dar
(Qanieî) kasib nye, boye kemî lē zanîwe !
bo ewanî tr bipirse lay piyawî kasibkar ?

[1.1] le nusxe desxetekana bew coreye

## 1.3 Dil̍ey xembar

ey dil̍ey xembar besye , ta be key giryan u zar? [1.2]
tazē bē sūde xeyal̍î mesken u yar u dyar !
bē selîqe hewrî negbet wa ke bextin cem bwe
tawe terzey meynetî pey pey le ser eȓijēte xwar
ey dil̍ axir xoshî chîte ! chūnke wa e?arit nye
ba, birînit hel̍kenim, ta bēte so wek zexmî mar
kwa ȓefîqî hemdem u, hem hem cilîsî hodeket
quȓ be ser xoy kwa cemalî dulberî zēba nigar
kwa xiȓey xirxal̍ u zēȓ u, goshewarey nuqreyîn?
kwa birîqey lachenax u , kwanē kēshî lifkedar ?
kē heye shew bēte pal̍it, bonî e'etrî bitgrē
kē be bal̍a wek chinarî taze xel̍fî new behar
kē be xemzey chawî mestî meh̄ebayît lē eka
kē be ȓemzî taqî ebro celb eka sebr u qerar
(Qanē'ea) xot u dil̍it, her qūȓ bipēwin dem be dem
to, le daxî em zemane u, ew le bo dîdarî yar ?

## 1.4 Tēhel̍kēsh legel shē'erekanî h̄afizî shîrazî

kakî chachî be yadî chawî nîgar
(yēk do sax̄er sherabē nab byar)
chawî wek ȓoj u, ebrwanî hîlal
(der myanē meh aftab byar)
shoȓishî dil̍ le kel?lema cem bwe
(nex̄meye berbet u robab byar)
awē bēne ke dil̍ bisūtēnē
(ye'enî în atesh cho ab byar)
chunke gul̍ daxmey le bulbul da
(badeyē nab chon golab byar)
shoȓishî wishkî zahîdî laben

[1.2] be boney kochî dwayî xēzanî gewreyewe daynawe.

(qul qul shîsheyē sherab byar)
xēr u sheŕ her chi hes, be des ferde
(ger xeta hest u ger sewab byar)
min ke hat shēt u serkesh u ŕendim
(ta bē kolî shūmē xerab byar)
mijdeyî wesĺî yar be Qanē'e den
(ger gonah hest u ger sewab byar)

## 1.5 Milwēnkî girēy diĺ

wa, serim dūbare gerd u lūl eka bo derdî ser
lay neda tawē le ser derdîserî u gējî xeter
bo muqedemey xeyalî wesĺî ŕoh̄im der ekem
ezmî* hēnde cezme h̄akim, xoy weha bū be cheper
nūkî mujganî emende xwēnî cergî cheshtwe
siĺ eka emŕo le sūrî, sūr heĺaĺî ber kemer
ca, ke wa bū her zemanē tîrî 'eîshwey xiste kar
dabiŕejîn eshkî xwenîn, chake bo de'eî zerer
cumle musteх̄nî le îshqin, boye gwē naden be xem
nergis u serw u sinewber, sosen u nesrînî teŕ
bendî cergim bo dezū , uqdey diĺim bo denkekey
bo jimarey fîqetî dulber le shew her ta seh̄er
Qnē'ea girpey diĺit, wa agirî ber da qekkem
Derdî diĺ emca be chî îzhar ekey xakit be ser

## 1.6 Legeĺ qeĺem

qeĺem ! qurbanî nūkit bim, de bēje feh̄set u guftar [1.3]
wekū h̄atem de bishkēne xezîney cewherî esrar
le beh̄rî îlmîi weh̄detda, nēdy lafî hunermandî
ne cēgey eqĺe bo bîr u, ne ŕēgey nutqe bo guftar
ke her eqĺē xeyaĺî kird, le beh̄rî fîkreda xinka

[1.3] shē'erî seretay lawētî wata le seretay bîstekana.

ke her nutqē beyanî kird, ŕiza wek cēge gestey mar
qeĺem ! hoshit be ser xo bē, ne nazî qet be dū zimanî
zimanit laĺe lem base, nenūsî shewketî cebbar
feqet sadey be choka bē u biŕēje gewherî teh̄rîr
binūse wesf u ewsafî ŕesūĺî eh̄medî muxtar
le ersey* kax̄eza ling de, be chalakî wekū ŕef ŕef
le ser meydaneda zū wergeŕē her wek melî baĺdar
qeĺem merdane nutqî da, cwabî damewe fermūy
be hîch eqĺit eshēwēnî, xerafet bo ekey îzhar
kesē wa bē le nūrî h̄eq be destî h̄eq cya būbē
chi muh̄tace be te'erîfî min u to u yawer u ex̄yar
kesē wa bē be ser pencey mubarek mang dū let ka
weya ahū le xizmetya be zimanî pak bika hawar
kesē wa bē ke dar xurma la bin der bēt u bē bo lay
kesē wa bē ke zîxî chem. Le desya bēte îstîx̄far
kesē wa bē ke ke cennet chaweŕwanî meqdemî ew bē
kesē wa bē ke sed ŕoh̄ulemîn boy bēte xizmetkar
îtir mustex̄nye (Qanē'e) le teh̄rîratî Emr u Zeyd
sikūtit lazime her ta binūsî defter u esh'ear

# 2 Beshî Z

## 2.1 destî cherx

cana gile meke, esĺa le cherxi bed mecaz
chen aqilanî zemanî, hēnaye gîr u gaz
qanūnî cherx u resmî zemane weha bū
cahîl be kam u shad u, edîban be ah u raz
mesned be desti heqe, hemū îshē her bewe
bîka be shētî kēwî weyan jîrî wek ayaz
Ferhadî nabekam enērēte bestūn
Xesrew le mĺk u maĺ, eposhē keway naz
chen aĺ u gorî kird, be silēman u ehrîmen
terwîc eda be shemu, be perwane soz u saz
qabil niye hergîz be huner nanē des kewē
naka le deshtî cehil fitaway chilî pyaz

Qanē'e metaî maĺî ke hemū shē'er u nuktetye
mer qur bipēwē kake, le birētî demax u naz

# 3 Beshî J

## 3.1 Temen u Arezū

umrekem barîk u kurte, arezūm pan u dirēj
fîkrekem fîkrî edîbe u, sūretîshm gēj u wēj
awî lafawî xeyaĺim, hēnde saf u roshine
awyarî xoy eka, bē ferqe lay hewraz u lēj
bē temasha le Kurda, da eposhē shē'e'rî min
pijder u goran u soran, cafetî u shîrwan u gēj
ger le nuktey xamekem dîqet bikey , îqrar ekey
ser be ser yaqūtî sūre u, shew chiraxî shule ŕēj
shexis wextî alime, alim be her eshya bibē
bē sewad wa tē ega, zanîn hemū des niwej u niwej
Qanē'ea munkîr eger fîkrî kulî amade ka
bēne der tēxî zimanî, her wekū shimshērî tîj

# 4 Beshî S

## 4.1 Eme ber le sheŕî yekem witrawe

aciz mebe hergîz le cherxî chepî abnūs
gishtî be destî ferde meqamat u charenūs
barî ke meylî hes, be xirap būnî memleket
espabî zahirîye [ordūy Turk u Rūs]
aya le haĺ u hukmî Suleyman sharezay?
yaxud le wez'eyat u, le e'emalî feyleqū s
gisht mest u matî xakin u bē des le her xîtab
ne pare kar ekat u, ne zimanî chaplūs
key merhemî ceŕahetî Zorabe Turkistan
Rostem chi sū dî dî, le shca'eatî Gîw u tūs?

naheq nîsar eka diĺ u rohî esîrî îshq
najî be bîmî xeĺik, sefayî kenar u būs
ya she'erî Qanēî chi teneum be -Qanēî-
chon bē ŕewace le lay biraderanî lūs u pūs

## 4.2 Bangî agadarî

de Kurde! gyanekem bezm u sefa bes
sefay piŕ zehmetî barî cefa bes
be dînim bit perestî are, bo dîn
desa persînî awî [Kanî Ba][4.1] bes
bizane chon echîte ŕizî hawmaĺ
be bē qazanc! îtr h̄aw u h̄ewa bes
biray Kurdm! ke xot naw na [minewer]!
bizane buxzî sher'eî [Mustefa] bes
meken hergîz xeyaĺî jēr desî xeĺk
desa koshish le her karî fena bes
de daway h̄eqî xot ke u hîch metirse
le diĺ dujmin îtr sherm u h̄eya bes
tecemu'e ba'eîsî teshkîle bo to !!
legeĺ hawmaĺeket, h̄erb u wex̄a bes
eger hat ecnebî lutfit legeĺ kat
be pare etkiŕē, eqĺî heba bes
eger Qanē'e etosh merdî le meydan
bese, hecwî hemū qewm u bira bes

## 4.3 Nameyēk

cenaba! nameket hat u geyshte des minî bē kes
minit dana be Kurdēkî hejar u bē kes u bē des
eger chî to enūsî [ashewanî] fexre lam qurban
ke chon esh'earî piŕ mana u, kelamî gewherînm hes

[4.1] nawî zyaretēk buwa xeĺik chūnete serî

eto saman u parey zor u koshkî berz u ŕenga u ŕeng
minîsh bē qewm u bē eshret, qesîdey agirînm hes
eto xincēr u shmshēr u ŕim u nēzet le meydane
minîsh heĺbestî piŕ mana u, pendî merhemînm hes
hemū samanî dnya pēshkeshî to bē wecax kwērî
minîsh sha beytî awdar u, hezaran aferînm hes
ke to mrdî be yekcarî ebîte mishtē xak u xoĺ
minîsh diway mirdinim înca, bizane dewrî jînim hes
eto nazit be shestîr u chek u dînar u baxate
minîsh nazim be Kurdane u, be Kurd biŕway metînim hes

# 5 Beshî Sh

## 5.1 Eger mirdim

eger, mirdim weten lawanî to xosh
eger Hîtler nema, gawanî to xosh
muxeyer bim le beynî to u beheshta
le cennet dūr ebim seyranî to xosh
hemū h̄orî mubarek bē be zahîd
le bo min her kich u x̄îlmanî to xosh
be min chî seyrî bax u qesrî Lubnan
weten seh̄ra u kej u kēwanî to xosh
eger dinya nema yekser be carē
weten germyan u hem kiwēstanî to xosh
eger nef'eî xusū sît tya nemēnē
mubarek bē weten, dewranî to xosh
eger xo Qanē'eî emro nemēnē
weten! ŕebbî weten xahanî to xosh

# 6 Beshî ’E

## 6.1 Mey noshî

din,

le mey noshîm eger men’em biken me’emurekanî sher’e
shikatî xom ebem bo lay h̄ekîmî haĺ zanî sher’e
beŕojū būm birom dî wamezanî mange bom derkewt
ebînm shoŕishî mange, le naw dēwanekanî sher’e
eger zahîr tenefū r ka’ le seyrî ŕūmetîi aĺit
ebē tūshî cezay xoy bē, be emrî amēranî sher’e
xeyatey zuĺfî dū ta kird, ke ye’enî la le cadey dîn
le nefîyo birdî bo îspat, hemū fermanekanî sher’e
le shewqî sefh̄ekey kuĺmî, ŕeshî egrîcekey taytay
xeyaĺim hate ser wesfî hemū neqĺ u beyanî sher’e
ela ey afetî diĺ emŕo bochî bē mirewet būy?
meger bîmit esĺen niye, le emrî h̄akimanî sher’e
le bo teh̄sînî mesnū ’ei xwa wek chawî to nabē
le naw dū sed ktēbxane u ktēb u defteranî sher’e
le baxî fîkrî milet, taze nējra darakey umēd
etirsim ŕîshekēshî ken, bira bēkarekanî sher’e
efewtēnē h̄uqūqî ēme bo nef’eî xusūsî xoy
diroy zil zil eka boman, be zimanî sah̄îbanî sher’e
be mestî Qanē’ei hat u, be mestane be choka hat
le ser derdî diĺî îcra eka emr u beyanî sher’e

# 7 Beshî Q

## 7.1 Endēshe

bē sūde îsh be x̄eyrez xeyaĺî h̄uzūrî taq
bē kare, kar le karî xeyaĺatî piŕ mezaq
h̄akim ke qazîye, be qezayetî ser ezel
bē sūde se’eî, le tesxîrî xurasan u Eraq
neqdî emel eger be sedaqet dex̄eĺ nebē
muste x̄nîye le [mih̄ek] ya, le zaxî pir simaq

mîzanî h̄ukim, ke be miqamat u tecrebe
dexlî cyaye beser le shem u sem'e ya mezaq
hēndē besher ke qabile, eydatē text u tac
hēndē be nanî wishkewe ekēshē beĺay shaq
barî kerim edat be Suleyman serwerî
Eyū b îmteh̄an ekat, be tekalîfî layetaq
cogey xeyaĺe dēte der le binawanî kuncî diĺ
silsî heye be miĺkî meqalatewe mezaq
bēsan u baxe ezîzim xeyaĺatî sha'eîran
bē xofî neqs u birdinî xeĺik be kesra cūt u taq
eywan serayî xase, derūnî diĺî edîb
ŕūte le tekalîfî shimshekēsh ya sîwaq
Qanē'e kifayetî h̄aĺî etoye be salimî
bexshîwye pet xwa, beyanat u qelbî saq

# 8 Beshî K

## 8.1 Bextî aware

ey le bextî ashiqî awareket ŕijd u chirūk
ey ke zîddin îsh u karit, sergiran u shēwe sūk
ger be naz bēte ser barî kerem, bo ashiqan
sed keŕet bēca ekat, shēx ŕū ekate ser silūk
kushtekanit ger shîkayet ken, le des cewr u cefat
mor eken boyan qebah̄et, qazî u muftî u milūk
min be dewr u pishtî yara (ayet elkursî)m exwēnd
ew be 'eîshwe pēy witim, lacho, heta key nū kenūk?
shēx eger boy shēt nebē, me'elū me bē wîjdanîye
chon be dayim shox u shenge, ber mîsalî taze būk
tan u poy bendî diĺ u cergî be carē heĺchirîm
wextē ŕemzî chawî xiste hat u cho her wek mekuk
Qanē'ea ŕendî be cē bēĺe, le bo gencî weten
to, le îshqit chî be keley pūcheĺ u giwey piŕ le tūk?!

# 9 Beshî L

## 9.1 Gerd u xoĺ

Kurd, mējū

dexîle saqiya heste, be chustî bēre gerd u xul
demē ba cha le dem da bē, demē qawe demēkîsh mul
le kelem tem eka dūdî henasey sed wekū Ferhad
le diĺma shoŕish engēze, binax̄ey hakimî Babul
le bîrim dē eya wa'eîz (ne'eim) bū y ŕojî îstîfham
minim qal u bela wērd u, kechî to pēm eĺēy batiĺ
min u to pēko westa būyn le sharistanî erwah̄a
le pēsh chawim wekū diwēnē bē waye meseley qabil
le pishtî bawe Ademda tekanim da le bo sebqet
muqedder baĺî tund bestim witî: qif eyū l'eacil
binoshe camî key Kurde, be yadî textekey cemshîd
le Eyūbîsh be aga be hetakū pēt neĺēn x̄afiĺ
min yar u diĺ u sebr u nishat u Qanē'eî bedbext
hemū ziddîn be yek wek shēx u bexshish, alim u cahil

## 9.2 Legeĺ dulber

ashiqi
ey dulberî afaq ne tenya min u bibil
sheydakerî dewran, chi chi hoshyar u chi x̄afil
sewda zede u shēt u perēshanî fîraqîn
em alemî îmkane, chi mecnū n u chi aqiĺ
chawit ke le her leh̄ze dū sed nergisî pes kird
wēranî eka muĺkî xîred, babî tewekkul
ey menzerî enwarî h̄eqîqet be nezaket
shagirde le ser birot, murshîdî Babil
pēkrawe be ser tîrî birot, cergî hunermend
bēchareye îla be Teter, pēchî selasil
destî tereb u qelbî teŕ u keleyî piŕ shewq
her sē be fîday xaĺî leb u perchem u sunbul

sef sef ke dewestin sefî ushaq
ger, ŕū nekene taqî birot micrim u batiĺ
xiwenî diĺî ashiq ke ŕija dawēnî girtî
tesîrî ewe Qanē'eî wa kirduwe be bulbul

# 10 Beshî M

## 10.1 Bîrî gencî

Kurd, mejū

diwēnē, be emel malikî emlakî qecer būm
xawen de hezar chawish u erkan u nefer būm
seh̄rayî u shestîr u cebel top u shineyder
gisht meh̄kemî 'eŕade, le ser bezmî sefer būm
gahē le diĺa, ŕū le teref Belx u Buxara
geh mayilî walatî hemū Turk u Teter bū m
qeĺxanî serî serkeshî em xeĺke shika yek
mensū rî xwa, xawenî shimshērî sefer būm
gahē le ŕewish seĺteneta, xadimî Quran
gahē be diro, wa'eîzî gurgîne le ber būm
geh ŕend u, gehē mest u, gehē natiqî hoshyar
geh bilbilî sheyda, le heyahū y chemer būm
alem wekū (gor)î ke le nēw mērg u chemen bē
behram sîfet, h̄azirî chen tîr u teber būm
fîr'e*en ke le lay seĺtenetim bechke shiwane
Mū sa sîfet u, ŕū le teref narî shecer būm
wextē kerē zeŕanî, emin dachĺekîmo
her (Qanē'e)ekey qurbeserî, piŕ le zerer būm

## 10.2 Ducharim

Kurd, Shikayet

bira, weĺa be derdē wa ducharim
be bē aram u sebr u, bē qerarim
eger giryam le ber bē hoshî Kurdan
meken men'eim ke chon bē îxtiyarim
temashay xom ekem, yekcar hetîwim
le sherq u x̄erbe da, bē xemgusarim
be eh̄waĺit qesem ey Kurdî sershēt
minîsh wek to, be bē bade xumarim
chilon negrîm be chawî xom ebînim?
ke bedgo! dēte ser coybarim?
hezaran înqîlabim hat be serda
kechî her min xewaĺū berdebarim..
meĺēn Qanē'e nezan u zor biĺēye
le qebrîshda be weĺa întîzarim

## 10.3 Penc xishtekî le ser shē'erî Bēkes

zanîn, zanin

**(be munasebetēkî taybetiyewe kirawe, 1963)**

sed shukur, emŕo tewawî min le zanîn bēberîm
dek mubarek bē jyanim, chunke mamostay kerîm
sed keŕet oxey ke dūrî felsefe u kiwerewerîm
(**tūshî lafawî îlim būm u beĺam zū derpeŕîm
siwarî papoŕi cehil būm u be nawya tēpeŕîm**)

chen zemanēke exwenim tawekū xom kird be pen
bîr u hoshim la nemabū , bo fîdakarî weten
serserîne! cejne emŕo, bēn hemū komeĺ biken
(**sed shukur oxey necatim bū le basî îlm u fen
namgirin carēkî tir, emca le keyfa heĺpeŕîm**)

hergîza u hergîz xeyaĺî jînî serbesti meken!!
tif le îlm u zaniyarî, bēn u zuŕna lēbiden
katē hatin cirtî zil zil car be car cūte bixen
(**gerchî ta ēsta witūme, tēbigen zū pēbigen**

**bew qisanem ewe qet biŕwa meken seg būm weŕîm**)

chende xoshe piyaw ke ker bē, chun kerî piyaw der exa
seyrî karwanî kerî ken, cashî xoy chon ber exa
her nezanîne ke (siwal̓et!) pēshî sed gewher exa
(**xwēndewarî shētiye her cehle însan ser exa**
**ger lemewdiwa nawî îlmim bird, bizanin serserîm**)

zengî bednawîm le naw em komel̓ey Kurda ziŕî
chun be desmayey jiyanim bîrî nîshtmanim kiŕî
chunke tēkosham heta perdey nezanînim diŕî
(**hēnde te'eqîbî h̄eqim kird, takū nanî xom biŕî**
**sūk u ŕîswa būm le nawa, gîrodey axir sheŕîm**)

ziwanî xot bigre dexîle, lew wishaney wa h̄eqe
chunke meshūre ke h̄eq lay bētemîz tal̓ u ŕeqe
chawî zana wa le daxa, xwēn eŕējē ebl̓eqe
(**chake zanîm h̄al̓î aqil̓, nefiye, h̄epse, ya sheqe!**
**her kitēbēkim hebū diwēnē le daxa diŕîm**)

her minal̓ būm bo weten, xom xiste naw gējî xeter
taze zanîm pulē naka, felsefe u she'er u huner
bēpishū kake minîsh, kewl̓î kerîm wa kirde ber
(**piyawî zana eql̓î dana, zanî boy nachēte ser**
**bergî nadanîm le ber kird u le h̄epsî der peŕîm**)

zengî zanayîm le daxa sherte qet ziŕey neye
bal̓î zanyarîm shikabē ta ebed fiŕey neye
hēnde bēdeng bim segî derganekem weŕey neye
(**sherte ker bim! bare giwēzim lēbinēn xiŕey neye**
**ba demēkîsh zor u kem, wek bē xemē bo xom bijîm**)

## 10.4 Shērezay Kurdim

Kurd

hemū kes sharezay min bē, ke shēr u sharezay Kurdim
be dayim giwe berawazî, delîl u ŕenumay Kurdim
xwa neyka eger derdē zuhurî kird le Kurdistan
wekū qochi xelîluĺa, be qurban u fîday Kurdim
fîdayî min le bo Kurdan, xusūsî qet nebînrawe
bichūkî begler u shēx u mela u shah u geday Kurdim
ecel destî min u dawēnî to firyakewe zū bē
be xom u ŕoh̄imo hazir, le bo def'eî beĺay Kurdim
chi baxē piŕ le guĺ, hergîz nebînrawe be bē bulbul
minî sewdazedesh wek bilbilî shax u chiyay kurdim
le xizmet ba becēmabim, be teyrē her ebim me'elūm
kewabū, hudhudî shehrî Slēmanî sebay Kurdim
le sūta chi bēbakim, ke chon pash mirdinim Qanē'e
le chawî ehlî danishda, wek ŕoh̄ tūtiyay Kurdim

## 10.5 Pēnc xishtekî

Kurd, weten, zanin
eyweten! dayim xerîkî shîwen u giryanitim
eyweten! sūtawî zamî derdî bē deramanitim
ger xwa bomka be weĺa gyanfîday lawanitim
eyweten! shēwawî h̄aĺî qewmî bēsamanitim
**dayima sewdazedey destî xem u hîcranitim**

xom ezanim chen kesas u diĺ birîn u ŕence ŕom!
xom ezanim, chon dūcharî zamî piŕ ēsh u besom!
ba, bizanin yek be yek, Efx̄an u Turk u Fars u ŕom
kohkendey bēstūnî fîrqetî shîrînî tom
**boye dayim bē tewequf, canbeĺagerdanitim**

eyweten! weĺa le būkî yekshewe zēbatirî
to, le dūsed kîmya u zēŕ u gewher chatirî
bo xumarî kele bēshik, to le mey sehbatirî
to be mumtazî le fîrdewesî berîn e'elatirî
**boye wek bibil hemîshe talibî giryanitim**

ew kesey tenya u be bēkes ŕoĺeŕoy bē, her minim

xemfirosh u, xemkiŕ u, ya xem be koy bē, her minim
ger be ŕastî bē tewawî, ya diro bē her minim
ger le dinya taqetî eh̄zanî toy bē her minim
**wa, muqîmim eyweten, wek shaxî Hewramanitim**

ger demîshim heĺdirūn, diĺ naĺe u efx̄an eka
chaw be bē fîkrî derūn, chon fēre xoy dar giryan eka
dar u berdi hodekem, her zîkrî ya Kurdan eka
**eyweten bo to bifewtēm, qochekey qurbanitim**

min wekū Eskenderim, kewtūme naw gējî memat
ey Eristoy xiwendewaran, x̄îretē bo ŕēy necat
eyweten! wek be'ezē kes giwē nademe hat u nehat
ger legeĺ yadî toda, serfî kem mudey h̄eyat
**wa ezanim mūnisî sed kewser u, ednanitim**

Qanē'ea nezmit peshēwe, daxekem fayey chiye?
min ezanim hewĺ u dadit bēsemer darî bîye
herchî hawarē ekey, lay bētemîz her fîfîye
baweŕit bē eyweten! lafim le esh'eara niye
**sha'eîrēkî giyanfîday, aw u heway nîshtimanitim**

## 10.6 Xem be ba nadem

ke min, xemxorî yaranim, yeqin qet xem be ba nadem
wekū tūtî shekir xorim, ch meylî xom be ka nadem
wekū cē pē, be bē ban u der u dîware kashanaem
kelawe konî wēranem be qesrî padisha nadem
ke min ustadî sermeshqî wefadaranî ealem bim
diĺî xawēn u be kînem, be be zuhdî parsa nadem
minî bubul binaĺēnim, le Kurdistaneda bo guĺ
shehadey mektebî îshqim be îmzay Ewrūpa nadem
le goshey zawiyey xemda, bigryem bo becēmawîm
duŕî firmēskî giryanim, be loloy shewchira nadem
diĺî xunchey nepishkūtim le sîney teng, ba teng bē
henasey etrî* efkarim, be sirwey bay seba nadem

ela ey ashiqî fils u fîdakarî meŕ u mēgel
bizane qedrî meenay xom, be parey naŕewa nadem
ewwa parawî cergim kird, be yekcarî le xwenî diĺ
sherabî xwenî xom Qanēe be bîrey bē beha nadem

## 10.7 Bade noshî

ke dulber bade noshî ka, ebē min xizmetî mēw kem
be shew awdērî baxat u, be ŕoj defeî chiĺ u chēw kem
ewende yas u bēzarim, le cherx u ehlî em cherxe
ebē teqlîdî Mecnūn u, xeyaĺî jînî ser kēw kem
ch ŕojēke xwa emŕo? Ke hawarî birîndarîm
newērim bangî bo heĺdem, be boĺeboĺî jēr lēw kem
moqeder baĺî tund bestim, derî kirdim le naw yaran
meger emcar be nacharî, ŕefēqî cinî u dēw kem
ke baxî arezūm emŕo nebē zahîd le meh̄sherda
îtir boch arezūy baxî henar u qeysî u sēw kem
xeyaĺim wabū, gochanî nesēh̄et heĺgirim bo ŕan
wekū Mūsa le deshtî eqdesa, shiwanane her eîw kem
Shuēbēkim nedî shertî shiwanîm bo be cē bēnē
îtir bo xizmetî ŕanî, be bē sūd u be bē xēw kem?
Chi xoshe Qanieî emŕo, le deshtî weh̄teda wek to
Be hîway cejnî serbestî, le xwenî cerig parshēw kem

## 10.8 Xerabatî

shewē pîrî xerabatî, îsharey camē mey kirdim
temasha ke! Le em lutfe, h̄ewaĺey textî key kirdim
le choĺî cehleda, xinkaw u tînū u bē ser u pē būm
be masi beh̄rî zanînî, be bē tenkawî pey kirdim
le îlmî badenoshî tēpeŕîm bo zarî u shîwen
be ustadî kemanche u ūd u tar u saz u ney kirdim
kilîlî baxî da destim, ke chūme naw guĺ u guĺzar
le, lerze u shanekiskēy befr u sermay mangî dey kirdim

weha fērî meley kirdim, le beh̄rîi weh̄deta emŕo
le goranî be baĺay cheshnî ser u memkî bey kirdim
chi umēdî bū yaŕebî be tenya yek nezer Qanēe
be suĺtanî xeyaĺat u be shahî sharî ŕey kirdim

## 10.9 Derūn tarîkekan

bema zor giyanfîday parem, be eqlim yek le h̄aciyanim
selem dadanî naw ladēm, delîle xeĺkî sharsanim
keshîdem dawe, sîwakim wekū daney feqîrane
xiŕey tezbēh̄ekem diyare, ke min shgirdî sheytanim
be fēĺ u desbiŕinîshim, nizîke bim be h̄acî shēx
were binwaŕe, seyrim ke! Ke chende shēxî ŕîshpanim
diĺim zor lē eda emŕo, biŕom gacūtē birfēnim
segē bikujim, kerē bidzim, ke wa bū min le ax̄anim!!
Eger bē ŕencberēkim bē, ebē nawî binēm segbab
Ke chon xom bapîr ax̄am u, kuŕî xanî qulî xanim
Temashay tay tirazū kem, diĺim zor xosh ebē Kurde
Be h̄oqey Estemūĺ chishtē bikēshim bo birakanim
Be gez sha bîkiŕim chake, be gez Sham u Heĺeb bîdem
Emem zor chake bo ŕojî h̄îsabî dîn u îmanim
Ke bēte barî dembazî u qisey zil zil le meclîsda
Wekū Qanēe be qurbanî, shiwanî hozî Kurdanim

## 10.10 Daxî diĺ

zanîn, Kurd, sofî

nema tirsî zemanî zū, îtir daxî diĺ eŕjenim
be hēzî meerîfet emŕo supahî cehil eŕfēnim
be serbestî ewî derdî diĺim bū, zahîr enwenim
lemewla xaneqa naŕom, be mewla tobe eshkēnim
**h̄eqî em Kurde bēchare, le chawdabestî estēnim**

diĺim zor xoshe emŕoke, exwenim bē xem u bē hem
le kuche u shar u bazaŕa, le ser her chîmen her chem
de sherte milqewî bē xēr, ebē binchîneket derxem
hemū fēĺ u qumar bazît, ebē yekser beyanî kem
**eger sed defe machî key quŕî jēr kewsh u dawēnim**

zemanēkî firawane, enoshim sherbetî taĺî
derūnim piŕ le eshear u, le tirsa defterim xaĺî
shukur ēstake kūkū me, be cheshnî kotirî maĺî
keway pestî u nezanînim dirî u yek defe dammaĺî
**be lafawî xeyaĺatim, nemamî îlim eŕwenim**

xem u derdî zemanî zū, weha chake ke ber ba dem
le sayey îlmewe shanēk, le shanî shēxî ulya dem
be ser chū dewrî meh̄kūmî le bo h̄uŕî teqala dem
le pîrî kon u pashkewtey wekū xom, lazime ladem
**kuŕanî pēgeyishtūy mektebim emŕoke edwenim**

de ya shēx sed esef bo to, nema shewqî diĺî xoshit
meh̄aĺe taze ŕamim key be mekr u h̄îleyî boshit
bifame quŕ be ser, chawit heĺēne wa, le kwē hoshit?
Eger to ehlî dînî! Xwēnî alem bo ekey noshit?
**were seyrî diĺî min ke, ke chende pak u xawēnim**

xeyaĺim waye ta ew ŕoje emrim h̄uŕ u serbest bim
be ŕoh̄ dujmin be exlaqî ŕezîl u piyawî nakes bim
desim bibŕin le ser nūsîn, le ser h̄eq xoshe bēdes bim
le ser em parche shēerane, eger gîrawî meh̄bes bim
**demēke h̄azirî dar u shelax u ezyet u ciwēnim**

le ŕojēko le dayik būm, be pakî būm u xuĺqawim
beĺam chî bikem? Be zincîrî esaret bend u xinkawim
weten siwēnim be kiwēstanit, le rūy dinya heta mawim
wekū masî be serbestî, x̄ewasî gēj u bin awim
**le binkî beh̄rî fîkra gewherî entîke derdēnim**

le her la shorî mecnūne, bizane h̄usnî leylaye
ke chon her kes be umēdî wissaĺî yarē ŕîswaye

dil̂î min bo tureqî Kurdisane shēt u shydaye
be destē chepl̂e lēdem daxekem deng u teqey naye
**gelē kes wa ezanin, xew ebînim yan eŕawēnim**

serim germe u be bagî berz el̂ēm, ey mîlletî hoshyar temasha ken le ewzaeî zemane u cherxî chep kirdar mel̂ē bawkim weha jiyawe, minîsh her wa ekem ŕeftar
filîmî sînema cherxe egoŕē ŕojē sēsed jar
**de chî bikem kes be giwēm naka, ke ax̄a nim u miskēnim**

## 10.11 Pēnc xishtekî le ser shē'erî Miftî Pēncwēnî

Kurd,

le sayey îzzetî nefsim, le pasha merh̄eba nakem
le erbabî kerem dūrim, be kes x̰om ashina nakem
kirasî chermî x̰om edŕim, siwal̂î ser ewa nakem
**eger chî leh̄zeyek derd u xem u qehrim be ba nadem**
**îlahî zor shukur, umēdî nanē min le sha nakem**

le tozî asheda x̄erqim, le tewqḭ̂ ser heta ejnom
ne t̰irsî emrî mafewq u, ne meh̄kūmî beratî tom
bel̂am chen xoshe ew toze, ke her xom amērim bo xom
**le sayey zehmetî qach u ser shan u̧ des u estom**
**le ber kes chaw ke ber nim u xeyal̂î ŕēy ŕiya nakem**

birakem firsete emŕo bil̂ē bew yarî dērînim
le ser her dînē min emrim, ewîsh her bēte ser dînim
ke chun shēranye fikr u xeyal̂î zîndegî u jînim
**le ber tal̂î zemane u sherbetî eshearî shîrînim**
**heta em dū teeamem bē xeyal̂î shekr u cha nakem**

chi xoshe, ta jînit bē, le lay kes kech nekey gerdin
ereq biŕjē le naw chawit, le ŕēgey kasibî kirdin
be shertē ser be serbestî, le meydana beder birdin

**be shaĺî xakekem ŕazim u eyposhim heta mirdin**
**le fason u gebrdîn, ta ebed seĺte u kewa nakem**

le ber pestî gelî Kurde, kewa ŕenc u teqalame
le ser em hoze chil saĺe, be tenya hewĺ u dawame
be taĺanî le des derchū, sefay em zeyd u mawame
**melayî u xwendewarî, xū u ŕewishtî xom u bawame**
**ke chî min arezūy nan u jiyanî wek mela nakem**
le dax em cherxe kechbaze hîlak u sîne chak chakim
wekū teyrē heĺo lēy da, kiz u xeĺtanî naw xakim
be bē hoshî esūŕēmo, eĺēy sergēĵî tiryakim
**weha x̄erqî meraqî piŕ cexarî karî napakim**
**eger xom bim be Luqman sedyekē derdim dewa nakem**

de sherte shertî merdî bē, le dinya ta h̄eyatim bē
ne hîway ser qeĺemdane u, ne umēdî xeĺatim bē
le ser em h̄aĺetî xome, eger bētū subatim bē
**be umēdim be serbestî le h̄eshrîsha necatim bē**
**le dinyada ke hîch kes, tūshî azar u beĺa nakem**

qenaeet* chake, wa chake bisachēnim be shorbawē
keway taqey minet labem, le ber kem shaĺ ya cawē
le ber daney temaekarî, nekewme gēĵî hîch dawē
**eger shēerē biĺēm u neshrî kem, hîchim le kes nawē**
**le fîkra peyŕewî merh̄ūmî zatî shēx ŕeza nakem**

hezaran aferîn Miftî! Le ŕeftar u le ayînit
be weĺa h̄eyfe to bimrî u birat heĺkate teĺqînit
legeĺ tūtinchî tēkeĺ ke, de Qanēe shēerî ŕengînit
**eger Miftî yekē peyda nekey hawderd u hawdînit**
**biĺē ta hem shikatî gerdishî cherxî le la nakem**

## 10.12 ŕū, le mehweshan nek sade ŕuxan

ger neĺēn dēwaneye yek shoŕishē berpa ekem
h̄ukmî cherxî kech medar u gunbedî xezra ekem

arezūy wesfî qedî, qed ererî* zēba ekem
h̄ez le pēchî larepēchî, Fate u Selma ekem
**h̄ez le lence u wirde ŕewtî Amine u Uzra ekem**

her kesē erbabî îshqe xoy le sade la eda
min ke miftî îlmî eshqim, diwenē fitwam wa eda
refetî* shîrîn be shēro, zeh̄metî kîsra eda
gencî badawer le gējî beh̄reda ber ba eda
**ashqane h̄ez le naz u, nazishî Tūba ekem**

labe gudle, îsh le perchem, bē ziŕey poyle u bilūr
sheq le lēwî bē xezîm u kuĺmî bē sūrawî sūr
qoĺ be bē xirxaĺ u zēŕ u, sîne bē milwēnkî mūr
namewē bore zelamē wek sepanî sharezūr
**meylî giware u piĺpiĺey banî serî Mîna ekem**

pelkeshoŕim des kewē, chîme le ser bē pirj u baĺ?
sed keŕet xiwa bîbiŕē, rūmet be bē sipyaw u xaĺ
îshqî sade sarde bēshik, her wekū ashî betaĺ
her ziŕey lerzaneye, derwēsh exate bezmî h̄aĺ
**îshtîhay xemze u nezaket, ay u of u la ekem**

kuŕ ke ŕūt u qūte esĺen, hîch meze u tamî niye
bē qetar u, giwar chenax u siĺsiĺe shewqî chiye?
darî lîmo her kiche, bē memke kuŕ darî biye!
bo yekē lēy tē biga lem shēere wesfî kafîye
**h̄ez le zîŕey ser serînî Rabeay* ax̄a ekem**

werne ser seyrî nezaket yarekey cîlwe firosh
taze būkē baneyî, yaxo le shēx̄î koneposh
ger be nazo chawî derxa, xanimî diĺ piŕ le xirosh
shēx be rîsh u mēzer u simtî chilon nanēte kosh
**ehlî wereim*, lēk seyrî, welweley dinya ekem**

boye xoshe, xeĺwetî tenya ziŕey lerzane bē
kich wekū shemeî minewer, kuŕ wekū perwane bē
geh le bezmî bose bazî, geh meyî peymane bē
Qanēeim emŕo xeyalî dulberî ferda ekem

## 10.13 Nekem chî bikem

ke bom des neda rendî desa teqwa nekem chî bikem
esîrîi zulfî tatatim, ke waweyla nekem chî bikem?
le kuncî somey* zuhdim, hezaran shēx shagirde
le shēx bedtir hemū serfî qedî tersa nekem chîi bikem
eĺēn Mecnūnî zū sheyda be baĺy sewlî Leyla bū
minî sheyda fîday baĺat, eger leyla nekem chî bikem?
ne Meh̄wîm take meh̄wo bim, ne Naĺîm ta binaĺēnim
be shorî shēerî shîrînim, felek sheyda nekem chî bikem?
le ewsafî Selah̄eddîn qeĺem mandū buwe emca
eger wesfî xerafatî kuŕî Kisra nekem chî bikem?
xeyaĺim waye bîrî diĺ, le ūdî sînema dexem
le bo em hoze cēmawe, dengē berpa nekem chî bikem?
le goshey baxî Kurdistan hezar Qanēe be bilbil bū
le batî baxewan emŕo, ke xom ŕîswa nekem chî bikem

## 10.14 Min u yar

ela ey mestî ashiq kuj, meke meneî diĺî zarim
ŕeqîbî bexit bergeshte, hemîshe wa le pēwarim
minim meh̄būsî zincîrit wekū Yosif le Mîsrî îshq
le ber x̄emzey keman ebro, wekū Eyūbî, bîmarim
ke dîm guĺzarî gonay ew, witim bex bex, chi baxēke!
wekū bulbul le ser guĺda, weha zar u birîndarim
be goshey chawî mexmūrit, shika qifĺî qerarî min
tewaw derchū le des eqĺim, ke wēĺî desht u kosarim
bih̄emdîla, ke xiwēnî diĺ, ŕengî da naxūnî dulber
eĺēn pence h̄ena ŕenge, nezer ke, cergî bîmarim
be îstîhza witî meh̄būbî min yarî x̄ezel baze
ŕeqîb sadey binaĺēne, le ber lēshawî eshearim*
le tebeî sist u fîkrî kuĺ, ebē chon shēerî xosh derbē?
le Qanēe qet nedey teene, bizane kone eyyarim

## 10.15 Xakî weten

ey xakî weten! quŕ be ser u bē ser u pa xom
bo bē hunerî ehlî weten, shētî cefa xom
cēmawe weten, bo wetenim x̄erqî fena xom
pestir le hemū hawser u hawmaĺ u bira xom
**dūr kewte u aware le her seyr u cefa xom**

ey xakî weten bochî nema x̄îretî shēran?
ey xakî weten bochî nema bezmî dilēran?
kiwa seĺtenetî ēlî* bebe u shakel u shîrwan?
bo misĺexî piŕ xiwēnî esîran u hejaran
**dek laĺ u keŕ u kiwēr u kiz u shēx u mela xom**

ey kax̄ezî terfîeî weten ! bochî diŕawî?
ey ŕewneqî bazaŕî weten ! bochî nemawî?
ey xencerî shēranî weten ! bochî shikawî?
ey xakî weten! chunke weha xeste kirawî !!
**ger shînit nekem, ŕūŕeshî dîwanî ceza xom ..**

bo ser kizî em hoze diĺ u cerg birîne
bo shînî weten, chawî xîred piŕ le girîne
bē shēriye emŕo ke weha bēshe h̄ezîne
nūrî beserî ehlî huner taneyî shîne
**bē alet u shimshēr, le meydanî wex̄a xom**

ey xakî weten bochî weha kiwēre wecaxit?
pejmirde u bē ŕenge, hemū chîmen u baxit?
piŕ le sitem u cewre yeqîn, derben u shaxit
ey xakî weten ! wērdî shew u ŕoje le daxit
**bo bē kesî em xake, desa bendî beĺa xom**

Qanēe were emcare, de x̄ewx̄ayē be pa ke
bo xakî weten ferze be diĺ ŕoh̄ be fîda ke
pîrahenî bednawî, be namūsî kewa ke

sef bigre be Kurdan u le chopî we sema ke
**ew wexte biĺē xawenî her bezm u hera xom**

## 10.16 Wesyetî dayik bo kich

kichim, ŕoĺey kizoĺey berdebarîm
chiray ŕūnakî bē destî u hejarîm
kichim, parchey nejakawî zemanem
netîcey îhtîmamî xiwendewarîm
were, giwē ŕagire bo pendî daykit
fereh̄ bexshî, derūnî bē qerarîm
kichim, hoshî h̄eya u namūsî xot bē
nekey karē ! ziyad key derdî karîm
nexoy hergîz firîwî saderūyan
nebîte hoy ziyadî shîn u zarîm
kichim, hoshyarî xot be takū mirdin
wekū min be, be ziringî u hoshyarîm
kichim, weĺa hemūy daxî kichane
nexoshîn u kizî u bē îxtiyarîm
ne tenha wesyetim bo toye ŕoĺe
fîdakarî kichanî Kurdewarîm

## 10.17 Kiŕuzanewe

xiwa, key bē keway taze le ber kem?
weya, parem bibē ezmî* sefer kem
xiwaya, to ke qazancit neda pēm
be nah̄eq bo ebē dayim zerer kem?
xiwaya, min ebē takey be zîlet
temashay destî Etrak u Qecer kem
xiwa parey le piyawî ŕezîle
ke min azam ebē her quŕ be ser kem
hemū ŕojē cezam sifrî meeashe*
le ŕey îsha eger xiwēnim heder kem

seeatēk chawish u tawēk meeawin*
gehē chēw kēsh u xom hawmil be ker kem
geh̄e newbet nehar u gahē leylî
geh̄e sifte be her edna nefer kem
ke min kuŕ adamim cennet be coyē
le dax Qanēe ebē meylî seqer kem

## 10.18 Berwarî mējūy Eh̄med Muxtar Caf

werin yaran temasha ken, le chawî piŕ le giryanim
chilon qirchey derūnim dē, chilonē cergî buryanim
le batî min biĺēn bilbil nexwēnē qet be mil gulda
ke chon taze le des derchū, esasî keyf u seyranim
felek eger ŕeh̄mî mawe, desa ba xiwēn bibarēnē
melek namūsî xoy derxa, hemū bîn bo eza* xiwanim
etirsim ger biĺēm shērim nemawe kes neka baweŕ
egerchi shahîde bo min xiroshî bēsheĺistanim
eya zumrey esîrî xem ! ewa xem hat be ser xemda
werin ba quŕ be serda keyn, le bo eh̄waĺî Kurdanim
eger dîqet le h̄aĺim key, ezanî zerbeyekî qurs
zihūrî kird, le ser xom u ŕefîqî ehlî nîshtmanim
weten emŕo be giryano, le bo tarîxî way fermū
shika ejnom, diŕa cergim, nemawe nūrî chawanim

## 10.19 Terkî ŕoh̄h u ser

ta h̄eyatim bē le diĺma, sherte mîhrit der nekem
roj perestim ta bimēnim, sucde bo exter nekem
shert u ehde* meylî germit qet le lam sardo nebē
ta, serim nedrūne caw u ziyaretî meh̄sher nekem
wishke sofî ŕîsh biŕawe, waeîzî ser mînberim
chon le daxî x̄eyrî ebrot terkî her mînber nekem?
ger wekū Mecnūn le kēwî Necdeda xo dagirim
shemsheme kiwērem keŕ u bo shemsekey xawer nekem
ger le lēwî leelî aĺit qetreyēkim des kewē

ŕūŕeshim ger terkî awî zemzem u kewser nekem
nūkî mujganî le xencer tîjtire bo qetĺî min
chon be carē tif le shîr u xenceru neshter nekem
erzî* yarim kird, ke boch perchem le ser ŕuxsarite
pēy witim bezme ! le ser chî ud le ser micmer nekem
her shewē dulber be nazo ŕū bikate menziĺim
ŕebî laĺ bim ger le ŕēya terkî ŕoh̄ u ser nekem
yar be îstîhzazewe fermūy Qanēea mawî shukur
lafî mîhrî to diroye, min ebē baweŕ nekem

## 10.20 Tenasib celb eka ebro

be x̄eyrez to meyl u meramî diĺ be dulber dem
ŕebî diĺ tūshî zexmē bē, ke her ber nūkî neshter dem
heta destî ecel komek be karim bē le defeî xem
eger ser berme be qeyser, serim ber shipî xencer dem
heta guĺ guĺ bibē kifnim, be zūxî cerg u xiwēnî diĺ
le zemzem cēm bidey giyana, chilon meylim le kewser dem
nesîmî subih̄ eger dūdî henasey fîrqetit bēnē
demaxim wishke wek waeîz, eger lūtim le shespeŕ dem
gelē memnūnî bextim būm be larî hate dinyawe
tenasib celb eka ebro, chilon qet ser le mînber dem
serim dana be berdî astanet bîkutim wird wird
xiwa heĺnagrē dîzey geŕaw ber denkî gewher dem
weha mestî xemim Qanēe le ser xo chūne ewzaeim
meger ŕojî qiyamet defeyē* yadē be meh̄sher dem

## 10.21 Heme zimankare

amed seba der sobih̄dem, sheq sheq derîde kerd x̄em
awerd būyē an senem, beshra lekom ya zuwelqelem
eŕay che Leylî xoy nebu? bershî ceten erwam bezū
che bikem? eyjim hey bawkeŕū, ez dax̄ē an nazok qedem
gēl gēl binim chux tasime, be xuĺay chi karim raseme
taĺe bex̄el gîch kaseme, feryad ez an mahî h̄erem
chepeĺ ke lewre derpeŕî, yawa binū derew meŕî

chun x̄er be wēncey teŕ zeŕî, fîshandūdem kirdey elem*
bizērizo, biŕizoyn, bizo mizaĺî kake shēx
watim pinet, gēre chenem, febet* ŕūh̄î bîlkerem
bo xet perî daĺkit qemer, golgūne reng ahū siyer
semîte qelbek h̄ecer, gonate sawî guĺ be dem
kenî we qurh̄anî mela, keftim le daxit lawela
gîrom berew shay Kerbela, ta mî bērandet der edem*
būshe we yari nazenîn, eŕay che neketa girîn
ez vîl u chawim piŕ girîn, kir tupe barî bu direm
dewar sewarēkî mezin, ŕimay ŕimo ez dax̄ o x̄em

## 10.22 Xeyaĺim waye

xeyaĺim waye zuŕnayek le ser shax u chiya lēdem
qoĺî bē earî* heĺmalîm, le bezmî bē h̄eya lēdem
le kellem* tem eka dūdî henasey sed wekū Ferhad
be yadî shoŕî Shîrînim, quĺingî bē beha lēdem
ke min ustadî Mecnūnim le îlmî shētiya emca
le kēwî Necdeda xoshe, ke lafî barega lēdem
seba mijdey bemin da, min be guĺ, guĺ birdî bo bilbil
de ba ūdî mubarek badî bo badî seba lēdem
chi destē bu xiwa emŕo girēy bedbexti labirdim?
be beste chepĺe ŕēzanî yedî beyza deba lēdem
be ŕeh̄met bē deh̄oĺ kut, wesyetē chakî bo kirdim
witî ba, bezmî heĺpeŕkē, be yadî kîbriya lēdem
minîsh wek Qanēeî emŕo, le girdî mame yarey xom
ebē zuŕnayî xoshbextî be shewqî padisha lēdem

## 10.23 Nazanim xom chîm

xetay bexte ke min dēwane karim
eger na, besh be haĺim hoshyarim
be qurbanit nebim, ey cherxî ser shēt
debo, yawer nebūy carē be karim?
eger murx̄im peŕ u baĺim le kiwēye?
eger weh̄shîm le kiwēye murx̄izarim?

eger berdim chilon her shew le layē
eger darim le kiwēye berg u barim?
eger însanim ey cherxî cigersoz
îtir ŕeh̄mit bibē bo h̄aĺî zarim ..
ewa umrim le chil diwanî ziyade
nebū, carē carē bibîte xemgusarim
ke min mirdim le pash mirdin eĺēn pēm
esef bo Qanēeî shîrîn nigarim

## 10.24 Cergî biŕawim

seyrîke, chi seyrēke ! kizey cergî biŕawim
biŕwane chilon keyle, le xiwēn .. perdeyî chawim
zamdarî xem u mîhnetî eyyame henawim
semtūre bira dengî diĺî piŕ le zūxawim
**perwane sîfet ashiqî enwarî chira xom**
**dēwane sîfet, ŕū le kej u shax u chiya xom**

tawē wekū Ferhad u, demē herwekū Mecnūn
geh ŕendî xerabat u, gehē cheshnî Felatūn
geh h̄atemî dewran u, gehē siwaĺkerî memnūn
geh laĺî be bē ziman u, gehē shaeîrî mewzūn
**tenya u be bē yawer u pisht u pena xom**
**bē cewher u bē qîmet u piŕ curm u xeta xom**

nemdî be h̄eqîqet yekē erbabî wefa bē
ya xud be sedaqet kemekē piyawî xuwa bē
bo shexsî nebē, nefeî umumî le diĺa bē
bo bē kes u bē dest, wekū bawk u bira bē
**her min le xema, der be der u bē ser u pa xom**
**zincîr le mil u besteyî naw dawî beĺa xom**

em ealeme* boch wa le h̄enay yekdî xirapin
bo dujminî bē est, fîdakarî (cenab)in
ashiq be mey u, zemzeme u ūd u ŕubabin
der heq be feqîranî weten piŕ le eîtabin*
**sed care eĺēm quŕ be ser pest u geda xom**

**wek Qanēeî bedbexit, birîndar u cefa xom**

## 10.25 Bo cenabî

eger xiwēnim biŕejin shew le ser cēm
zimanim der bikēshin takū ber pēm
be dest destaŕî nanî dujminim kem
le h̄epsî zaĺimî em dewre biŕizēm
be zistana le naw befr u sehoĺa
felaqe u ezyet u, darkarî bikrēm
be hawîna be aw u be bē nan
be kiwērî bimxene seh̄rayekî dēm
be derzî kēwî goyjem pē bikēĺin
ewey hatuwete ser zarim her eyĺēm
lewem pē chatire bichme wiĺatē
ke kes nemnasē xom kēm u kuŕî kēm
eger Qanēe le lay (.) behesht bē
xecaĺet bim, eger carēkî tir bēm

## 10.26 Ah u naĺey derūn

ey xuwa chî bikem, le daxî bextî nahemwarî xom
wa serim shēwawe ŕēga nabeme ser karî xom
diĺ chilon nepsē le daxî destî na edlî* zeman
nayeĺē dastē bibem, bo merhem u tîmarî xom
qet le ēsh u cewrî dujmin, ax u daxēkim nebū
min enaĺēnim le destî cewrî haw diĺdarî xom
her nezanē to ebînē, xawenî shenēkî* berz
min le des zanîne pestim, tif le her hoshyarî xom

## 10.27 Toĺe sendin

be serma, ŕa mebūre kakî zaĺîm
le destî zuĺmî to, wērane maĺim

be shew eshikchî maĺi xan u ax̄am
be ŕoj koĺ kēshî pūsh u diŕk u daĺim
eger ŕakem le bo miĺkî yekē tir
lewēshda quŕ be ser her eynî* haĺim
le des qanūnî pîsî mîr u ax̄a
le her la bim, be des zuĺmo enaĺim
de zaĺim noreme, xot ŕagire bom
bichēje sherbetî gurz u gopaĺim
be tenya chaw le quncanēk bizane
esēnim h̄eqî zuĺmî chendi saaĺim
h̄eqî cūtyar u paĺe u ŕencberanim
h̄eqî chewsannewey xom u minaĺim
be zebrî chekushî Kawe mēshkî epijē
qewarey pucheĺî, Zuh̄akî zaĺim
chi xoshe bēte dî, amancî berzim
îtir koshk u telarî mîr nemaĺim
chi xoshe hēzî ŕencber ŕabimaĺē
qeĺa u zîndanî ax̄ay bed fesaĺim
chi xoshe min biĺēm ax̄a chi karey?
Biĺē: emŕo le gumrikda h̄emaĺim !!
chi xoshe mîr be eînwanî kirēkar
biĺē: îshit niye emŕo betaĺim
chi Qanēea bē xof u endēsh
biĺēyt: zaĺim le kiweye, min zewaĺim?

# 11 Beshî N

## 11.1 Nazenîn

ela ey nazenînî shoxî shoxan
x̄ezale taqekey ser bendî kiwēstan
mekanit kuncî diĺme, zor nizîkî
le ber chî nabîye awazî giryan?
be xem ger bimkujî, ew wexte shadim
ke xakēkim ebim be tozē daman

ŕeqîb boye ezanē min le latim !
ke bulbul dayîma, ha, le guĺistan
le kushtin chon etirsim ŕojî sed car?
ke lēwî toye cheshmey awî h̄eywan
diĺ u giyanim be pēshkesh qasîdit kird
xirapî kird, hewaĺî day be hezaran
zemane îsh u karî her be ekse*
chi nisbet Qanēe u îshqî cewanan ?!

## 11.2 Her sēkman

min u shēer u gedayî pēkewe būyn
be teh̄tîq her sē hî yek būk u yek shūyn
min u shēx u mela her sē be weĺa
beheshtman da be shekr u bo seqer chūyn
min u sofî u bizin her sē be ŕîshîn
le ŕishman tē biffikrîn her wekū cūyn
min u kerwēshk u begzade le tirsa
ser u giwē nizm dayim her wekū buyn
min dēwane u h̄afiz le bo nan
hemîshe qîl u qal u h̄aw u h̄ū h̄ūyn
min u serkar u mîr bē îsh u karîn
ke boye bē wefa u bē shrm u abŕūyn
min u shēxzadekanî îstekanē
le pash chendē ! le hey tur u le her tūyn

## 11.3 Serbazî

ser le bo serbazî chake nek le bo chetfey giran
diĺ le bo xemxorî chake nek le bo mîhrî kichan
chaw eger firmēskî xwenîn daneŕējē bo wiĺat
dek be kwērî her bimēnē tawekū axir zeman
dem eger hawarî hozî xoy neka piŕ bē le quŕ
sîne wek kotir nenaĺē, piŕ bē le jan
boye shanim pē ewē, barî xemim bo heĺgirē

ya zimanim boye chake, bibŕē wek tēxî deban
bo cilît bazî qise u meydanî fēĺ u des biŕîn[11.1]
shehsiwarēkim be cheshnî Rostemî Mazenderan
bēte ser barî kerem yek dane co nadem be kes
xom be coyē eyfiroshim, aw u xakî nîshtiman[11.2]
min be dem mîlet* perestim, xizmetî Kurdan ekem[11.3]
xwēnî babîshim eŕējim bo tema'eî yek qeran
aferînim barekeĺa îshî xome chaw u ŕaw[11.4]
dū diĺ u, sē dulber u, chiwar mameĺe u, pēnc shesh ziman
tawē Xandîm* bo weten terkî hemū xorak ekem[11.5]
tawē shēxî xaneqam u, tawē cerdey ser milan
tawē embînî efendîm, etr* u sabūnim heye[11.6]
leh̄zeyē seyrim ekey shēx u mela u ŕîshēkî pan
her shewē parem bibe teqlîdî sed Xeyam ekem
her se'eatē mey nebū, bermaĺ u shanē u teylesan
tawē Kurdim, ŕank u chox̄e u mēzer u pestek le ber[11.7]
gahē shepqe, geh qelensū, gahē xudey ser gran

## 11.4 Legeĺ Zanîn

chakî chilonî merheba zanîn
bo pēsh kewtinit hezar aferîn
baweŕim heye be sîdq u yeqîn
her to pēsh exey komeĺî bē tîn
**aferîn zanîn! hezar aferîn**
shîre gerchekit kird be kareba
asin u darit wek ker bar eba
bē telît wishe share u shar eba
aferîn le to, zanîn merheba
**aferîn zanîn! hezar aferîn**

---

11.1 1,.., 7 kēshaneye bo mamostayekî nîshtiman perwer.
11.2
11.3
11.4
11.5
11.6
11.7

birēshkey shexsit kird be pensilîn
ciger be tirshit kirduwe be kinîn
chen hezar shēxit xiste zar u shîn
ŕū, le siqūtin gisht mat u h̄ezîn
**aferîn zanîn! hezar aferîn**
zanîn to weh̄shî dēnîte ziman
diŕindey ser kēw ekey be însan
kuŕî feylesof, bē to wek h̄eywan
esūŕētewe koĺan be koĺan
**aferîn zanîn! hezar aferîn**
le dū parche dar sinūqē ekey
dengî ŕojheĺat bo mex̄rîb ebey
gerchî car carîsh zererē exey
mishtekoĺ le dem hejaran edey
**aferîn zanîn! hezar aferîn**
be boney towe zik heĺediŕin
nexoshî naw zik le ŕîshe ebŕin
zincîrî zorî zordarî echŕin
dewĺet be dewĺet shar be shar efŕin
**aferîn zanîn! hezar aferîn**
ashkiraye to shitēkî chakî
hoy serkewtinî diyar u xakî
le giĺop chatir berz u ŕūnakî
le pēsh kewtina siwarē chalakî
**aferîn zanîn! hezar aferîn**
beĺam ey zanîn lēm ziwîr mebe
to ser Eristo lēm diĺgîr mebe
h̄ez ekem genc bî, hergîz pîr mebe
labe xizmetkar, sha u wezîr mebe
**aferîn zanîn! hezar aferîn**
her espabî xwēn ŕijandinî
her tosh espabî mēshk pijandinî
her tosh wasitey jin qîjandinî
her tosh wasitey xak bējandinî
**kelebchey destî komeĺî bē tîn**
shestîr ŕēk exey wek hewrî behar
gule eŕjēnē le ser ta be xwar
hejaran ekujē wekū geĺay dar

be boney towe zor eka zordar
**kelebchey destî komeĺî bē tîn**
gisht xetay toye ahî diĺî teng
gisht xetay toye le ŕūy gētî ceng
to bē deseĺat egorî le ŕeng
malî xeĺk exon be lūley tifeng
**kelebchey destî komeĺî bē tîn**
qunbeley zeŕe to hēnate kar
be yek qunbele esūtē chen shar
ekey be mirdū chen kichî nazdar
chak wēran ekey ber koshk u telar
**kelebchey destî komeĺî bē tîn**

## 11.5 Wesyetname

ŕoĺe! wesyet bē ke mirdim seyrîi em esh'eare ke
hefteyek carē temashay shorî em guftare ke
babî xot ŕeftarî chon bū, tosh her ew ŕeftare ke
ŕū le qazancî umūmî u pisht le xawen pare ke
**bēre meydanî dilērî, her wekū shērî jiyan**
**cergîi dujmin heĺdire u bibŕe weku tēx̄î deban**
ŕoĺe! Lafî feylesofî lē nadey hergîz be dem
nokerî hergîz nekey, bo h̄akimî Rom u Ecem
chî le diĺtaye metirse bîxe ser nūkî qeĺem
gwē nedey ŕoĺe, be cewr u ēsh u azar u sitem
**ŕapeŕe u bangē bide, bo xizmetî Kurdî ziman**
**berxî nēr bo ser biŕîne, nek le bo doshîn u ŕan**
ŕoĺe! dayim chaweŕiwanî heĺmetî shērane be
dujminēkî zoĺe Kurdî, nokerî bēgane be
her be hîway deng dilērî u jînî serbestane be
kewte ŕojî xoy xerîkî toĺeyî dū lane be
**ŕoh̄î shîrînit derēne, bo deway derdî giran**
**ŕū kere Qendîl u Ako, her biĺē ya nîshtiman!!**
Keĺūŕ u, Sursur u Geshkî u sharî Kirmashaneket
Bextiyarî u Menimî u, hem Sahkelî u Shîrwaneket
Mayidesht u Baceĺan u Sanî Hewramaneket
Pijder u Biĺbas u Herkî u, Cafetî u Goraneket

**des be des yektir girin, bo yektirî wek pishtîwan**
**tē bikoshîn bo jyanî Kurd u, xakî Kurdistan**
ŕoĺekem! xwēndin bixwēne mektebe dermanî Kurd
tē geyishtin merheme, bo zamî bē samanî Kurd
lapeŕey mējū ezanē, chon buwin shēranî Kurd
basî baba Erdeĺan u, Zendî u Babanî Kurd
**Ewrūpa nūsiwye bo to, yek be yek wek dastan**
**tosh be chakî ŕaygeyene, bo nexwēndey Kurdekan**
Ew jyane! key jyane? wek kewî bendî qefes
Jēr chepokey ŕafizî bî u, jēr desey pyawî teres
Pet le mil bî u ŕat bikēshin, her wekū tancî u meres
Namewē ew core jîne, dek xwa neyda be kes
**qef qefî h̄eĺqey kelepchet heĺbiŕe wek paĺewan**
**xot u mindaĺit be kusht de, bo rewacî Kurdistan**

## 11.6 Legeĺ bulbul

ey bulbulî bē dane, min u to hejarîn
her dū, wekū yek mutezîrî fesĺî beharîn
to cheshnî min u min wekū to bē kes u karîn
damaw u kiz u derbederî kūche u sharîn
**ya, bendî qefesxane, weya wēĺî diyarîn**
min quŕ be serî destî felek, cherxî cefakar
to diĺ be xemî, derdî guĺ u xuncheyî guĺzar
min derbederî fîtneyî casūsî xetabar
to, bē peŕ u baĺ, le des zuĺmî liqî xar
**her dū beyeko chake biĺēyn, dîl u hejarîn**
to, shētî diĺ u, min be hîway berzî wiĺatim
to, mestî guĺ, min be fîday ezm* u subatim
bem core eŕom, sherte heta mawe h̄eyatim
ta des nekeme gerdinî awatî necatim
**ŕūm nayē biĺēm: zadeyî shēranî shikarîn**
min, shîwen u giryan u eto shor u terane
to, bezmî sibeynan u, minîsh ahî shewane
min, bo wetenî bē kes u, to dane u lane
binwaŕîn le bo sūŕî kechî cherxî zemane
**bē sūch u xeta, bochî weha bē besh u yarîn**

ey bulbulî hawderdî xefetbarî derūn ŕēsh
tosh her wekū min, bē kes u bē yar u bē xwēsh
her dū, wekū yek pest u birîndar u cefakēsh
key bē ke birînî diĺî her dū bibē saŕēsh
**bē bak biĺeyn ēme la naw gētî diyarîn**
Qanē'e min u to, bilbil u xem, cheshnî bira būyn
bo yektirî em chware, tewaw pisht u pena būyn
her yek, le bo ew syanî tire, zor be wefa būyn
bochî min u xem? îste le ew dwane ciya būyn?!
**bulbul le guĺ u, guĺ le chiĺ u, ēme le xarîn?!**

## 11.7 Bo kichekan

**be zimanî kichekanî Qanē'ewe witrawe:**

ēme ke kichîn, dulberî diĺdarî cîhanîn
xunchey chemenî baxî guĺî Kurdanîn
estēre le ŕūy ēme, chilon xecĺetî nabē
ŕoshintir u piŕ nūr, wekū mangî cwanîn
wesĺî h̄eremî ēme, le bo xadimî Kurde
bo bē hunerî xakî weten! nesî h̄eramîn
bē qîmete lay ēme, yeqîn bergî chiwît lî
ashiq be huner, mestî x̄ezeb, tēx̄î debanîn
sheq lew kuŕe, wa des be xene u, meylî h̄emame
qurbanî kuŕî serkeshî, Kurdanî zemanîn
wextē be sefa sef ebesîn ŕojî seyah̄et
mayil be kuŕî Kurdî wekū shērî jyanîn

***

ēme ke kishîn, quŕ be ser u mat u h̄ezînîn
bo bē kesî em xake, ciger zam u birînîn
ey komeĺî gencanî musemma be minewer
bo mergî weten, ēme hemū elbîse shînîn
chon ēwe hemū, bē xem u bē bîrî wiĺatin
ēme be x̄ezeb, diĺ be xem u, dîde girînîn
sed kashkē le cēy ēwe, sefî ēme biwaye

et dî! ke chilon hazirî meydanî yeqînîn
daxman eweye ēme jin u ēwe piyawin
ēwe be huner ?î u ēme metînîn
her ŕojē ke ēwe be emel seyr u sefa ken
ēme hemū bo ēwe xerîk zarî u shînîn ..
ēme ke kichîn her be kichî 'eaciz u pîrîn
damaw u serasîme u bē shewq u esîrîn
Qanē'e, be hemū teb'eî x̄ezel xwaniyekeyo
shahîde kewa ēme hemū mat u ziwîrîn
efsūse ke ēwe, kuŕî meydanî niza'ein
zor yazūxe bo ēme, xerik nan u hewîrîn
shēr derchē le x̄abat, xway nēr u xway mē
lakin, eme zor eybe ke bē pisht u zehîrîn
dwēnē kichē eywit, be kichanî wetenî Kurd
î'elane eya her chî ke bîrîn u sex̄îrîn
em derpē le pēmane, le pēy bē hunerî xak
em îshe le sermane le ser bed diĺ u napak

## 11.8 Qanē'e u kereky

kerēkim bū chi ker? wek baw u boran
kerēkim bū chi ker? barkēshî dewran
kerēkim bū chi ker? cheshnî seyare
kerēkim bū chi ker? wek shērî meydan
kerî Nuh̄î nebē, bapîrî em bū
legeĺ gwē dirējî ˆsa, xaĺ u xwarzan
be, lashe berz u, zik estūr u ser zil
kefeĺ gurc u, perasū chîx u, gwē pan
sheqaw dar u, dū shane berz u, mil qinc
kilik shoŕ u, sipî tūk u, qewî dan
le kewshî sim, heta larî ŕefîsgey
xetēkî mussteqîm, be kesr u nuqsan
shewē pēm wit: chilonî yarî dērîn?
ewa serma bizūt, destim be daman
îtir zestan u, katî dar kēshane
wekū saĺanî pēshū bēre cewlan
ne nanim hes, ne shekrim hes, ne chayî

ne bergî xom u jînî baqî xēzan
hemū, her chaweŕwanî hîmetî toyn
binirkēne be baro u, bēyte meydan

**weĺamî kere shîn:**

witî: Qanē'e! esef bo bē h̄eyayît
h̄eya, zor xoshe bo piyawî be wîjdan
be kam cē? kam gewiŕ? kam naĺ u bizmar
be kam ŕeshwe u cil, cil bend u kurtan?
eme chil saĺe min barkēshî ēwem
be xew nemdî cewaĺî aĺif u dan!!
wesay naĺbendî min, wek teyrî enqa*
nebînrawe, le ŕūy dewranî dewran
be ew naĺe qesem, netda le jēr pēm
be ew coye qesem, nemnaye jēr dan!
qesem bew gaze nemdîwe be umrim
be ew chekushe, ke nemdî mer le lēdan
ebē xērim nebē x̄eyrî zeŕe zeŕ
eger wirdîshî key e'ezam be gochan

## 11.9 Lemewla chî bikem

minim kemtir hejarî xakî Kurdan
enūsim komeĺî wîjdan u îrfan
werin! Kurdîne gwe bigrin le qewlim
kitēbî tir eĺēm, wek bax u bēstan[11.8]
le we'ez u mew'eîze u esh'earî mîlî
le te'erîfî wiĺat u aw u kwēstan
le fezĺî gewreyî u, ŕesmî bichūkî
le te'elîmî minaĺ u ehlî îrfan
le chakî îtîfaq u, komekî yek
le haĺgirtin chek u, wēstanî meydan
le basî kasibî u te'elîmî nūsîn

[11.8]mebestî le (gulistan u būstan)î Se'ediye.

le nasînî nijadî dak u baban
le koshish kirdinî, efkarî mîlet
le ewza'eî melayî u basî shēxan
minim Qanē'e be tenya u be bē kes
xwa heĺsin le xew lawanî: nîshtiman[11.9]

## 11.10 Shēranî mekteb

ēwe ey shēranî mekteb! wasîtey jînî minin
wasîtey jîn u jyan u, ŕoh̄î shîrînî minin
komeĺî ewladekanim, wan le zuĺmatî cehil
taqe ēwe xwēndewar u, nesĺî nūrînî minin
mudde'eî ger bē xeyaĺî nam u nengî min bikat
bo wîqayey h̄ifzî nengim, ēwe perjînî minin
asiman nabē xeyaĺî, berterî u ziyadî bika
asimanî asimanim, ēwe perwînî minin!!
sed ke dēm u bē berawim, min le kiwe (qurfe) le kiwe
tē bifikrēn to xwa me'emūrî* texmînî minin
merheme teskînî zam, duktere def'eî beĺa
bo diĺî piŕ ēsh u zarim, ēwe teskînî minin
ger wekū Qanē'e le bo terfî'eî min koshish biken
lawekanî xoshewîstim, koĺekey dînî minin

## 11.11 Hejarî

gedayî seyre! ey yar u ŕefēqan
gehē poshte be pîne u, gahē uryan
gehē tūŕe le ewladî le birsa
gehē dawa le h̄acî bo letē nan
birakem! dewĺemendîsh wa ezanē
geday bo ew dirūst kird, zatî yezdan
be bē ŕeh̄me le der heq piyawî bē des

[11.9] le nusxe destiyekeyda bew coreye.

firîbî xeĺk eda wek bechke sheytan
geday beste zimanîsh, hēnde ŕute
ne nanî hes, le bergî hes, le zistan
le hawîna le ber bēgarî ax̄a
be xemnakî ejî u exizēte naw lan
kechî kiwēxa echē, destî ekēshē
be girye u zarî eykēshēte meydan
emesh ŕūnake, kiwēxa cheshnî tancî
be dem kerwēshkî bo egrē le ser lan
ewey namūsî bē, nabē be noker
ewî însafî bē, nachēte dîwan[11.10]
ewey wîjdanî bē nachēte lay mîr
ewey ŕeh̄mî bibē, nachēte lay xan
chi xoshe zig be birsî, pē be bē kewsh
be mercē ŕū nekate, shēx u qurban!!
geda bî yaxo pasha bî, her emrî
îtir kilke leqē bochî le dîwan?!
eger piyawî were! areqe biŕēje ..
binirkēne wekū shēr, bēre meydan
qezay ew bēle, ew eyda be erza
le dū sed biŕnewî deskarî Eĺman
qezay ew dase ewsawî ke tîj bē
le sē sed xencer u shimshērî zor jiwan
qezay ew tozî gagērey sepane
le dū sed etr* u qesrî mîr u xanan
egerchî Qanē'eî zor zor hejare
bih̄emdîla, be kes naĺē, beĺē xan

# 12 Beshî W, O, U

## 12.1 Shē'erî tur

KuKuKurdim, zzwanim, lelelaĺe, tetewaw
ne nezanî , mimimaĺî, kikikirdim , x xraw
ŕefîqim, siswarî, bibiba būn u minîsh

[11.10]mebestî lewaneye ke xizmetkarî eken u le dîwexanî ax̄ada dest be singyanewe egrin.

bo necatî hohohozim, lelebatî titifeng
sisîwak u ŕi ŕi ŕîsh u kekekeshkoĺî shikaw
lelelay xom memelam u nenenemzanî shitē
x̄eyrî basî mememar u, qeqeqewr u, h̄eh̄esaw
fefefître u, zezekat u, yeyeyasînî nexosh
e e agir , ceceh̄enim, bibiĺēsey be taw
pipirdî sisîŕat u , hehehengwēnî behesht
h̄oh̄oh̄orî cicwan u , mememîwey tetewaw
didrējî cececaĺ u, kukukurtanî kerî
kukukushtin MeMesîh̄ u, e e 'easay bibinaw
e e ēshik meminaĺ u , gegegirtin sheshewe
hehehaĺî jijinan u, bibibūnî be chaw
e e emane bebeyanim kekekirdin be shē'er
le minaĺî xexerîk būm, heta būm be pyaw
(Qanē'ea) shē'erit be safî qîmet u nirxî nye
to, temate ke be laĺî nawî xot xeytewe naw

## 12.2 Cergî buryan

birakem h̄aĺetim giryane emŕo
diĺ u cergim tewaw buryane emŕo
be yek leh̄ze du sed h̄aĺim egoŕyet
temashay h̄aĺetim seyrane emŕo
le baxî mezre'eî* îqbaĺî larim
le xem ko ko wekū xermane emŕo
ewende peste bextî shūmî neh̄sim
le bextim wa'eîzîsh sheytane emŕo
giriftarim be derd u bē pizîshkim
tedawîm her xem u giryane emŕo
sitarey bextî neh̄sim wa le goma
le eqreb talî'eim , mîzane emŕo
xemim tac u seraperdem nexoshîn
derūnî diĺ eceb wērane emŕo?
wekū (Qanē'e) xeyaĺî gewreyîm bū
ke chi ēste xemim bo nane emŕo

## 12.3 Tēheĺkēsh

ashiqî diĺ be xem, nekey ! hewa u xeyaĺî xurd u xew
(badeyē dēlgosha bēcū, tazē bē tazē, now bē now)
katē ke yarit dēte lat, le gējî xem etda necat
(būsē sētan bē kam ez ū, tazē bē tazē, now bē now)
chîte le sîh̄rî abidî, ya wishke zuhdî zahîdî
(badē bēxor bē yadē ū, tazē bē tazē now bē now)
to her demē meraretē, ew her shewē nezaketē
(neqsh o nēgar o reng o bū, tazē bē tazē now be now)
(Qanē'e) eger musheŕefî h̄uzūrî yarî xot ewē
(qēsēyē h̄afēzesh bēgū, tazē bē tazē now bē now)

## 12.4 Lasayî kirdinewe

Kurdîne ! ŕojî shadye, hemū de bēne hat u chū
wa derdî diĺ shukur nema, shadî biken be zū be zū
chon shadîyē le xoshî diĺ, wek coshî mencel bēte kuĺ
zuŕna be a a a e a, dehoĺ be

# 13 Shē'ere hemecorekanî

## 13.1 Maĺ besh kirdin legeĺ birakem

bira ! wa bawkman ŕoyî be ŕehmet
chak necatî bū, le derd u zeh̄met
bawik bo hîch kes namēnē ta ser
kuŕ ew kuŕeye le (kiĺ) bēte der [13.1]
mesele meshūr biraman birayî
beĺam bew sherte kîseman cyayî
maĺeke besh keyn bē mela u qazî

[13.1] wekū kiĺî hewr, wata le taqî kirdineweda derbichē.

yek le yektirî chak bibîn ŕazî
ew hēsre shētey cūte weshēne
dabinē bo min hîch damemēne
ew pishîle cwaney piŕ xet u xaĺe
chish ba bo to bē, ŕewneqî maĺe
ew cūte mangay zil u zor xore
ke yekē shine u, yekēkyan bore
bo min .. dū mirîshk larî u hēlke ker
dabinē bo xot, be bē derdî ser
ew mayne pîrey zîn heĺchirawe
merh̄ūmî bawkim bo minî danawe
beshî to le ser em mayne nye !
bawkim fermūye xetay min chye?
mis u mesîney le jenga pwaw
day binē bo min, le sax̄ u shikaw
kîteĺe u goze, dîze u derxone
hemūy bo to bē le taze u kone
qet pare nadey bo sipî kirdin
misger nanasî, ta ŕojî mirdin
ziringey mencel u , zeh̄metî sînî
le xwam gereke to qet neybînî[13.2]
ew awe sarde , le ew cewene
daybinē bo xot, her pēy pēkene
ew hîze ŕoney kuĺk u mūdare
dabinē bo min, charim nachare ?
le dergay h̄ewshe tawekū ser ban
dabinē bo min ser pak hodekan
emma le ser ban heta asiman
hemūy bo to bē, bē kesrî u nuqsan
herdūkyan bo min ga sūr u ga ŕesh
dū segman heye bo to le cēy besh
ne kay bo bēne ne cēy bimaĺe
hîch erkyan nye, ew dū gemaĺe
shew ta beyanî be cūt eweŕin
h̄elyan lē ekey, sik pyaw ediŕin
bira, wa maĺman tewawî besh kird

[13.2]le chape konekana nūsrawe: ....... teĺebe, to qet neybînî

hemū be zyado beshî xotit bird
elh̄emdūlîla be bē diĺ yeshan
cya būyno le yek, be sehl u asan
herchen mex̄dūr būm, beshî to zore
le ber taney ’eam, ŕazîm bem core
ba, xeĺqî neĺēn biŕwane h̄aĺî
tema’eî kirde biray mindaĺî

## 13.2 Azîz hîlakim

azîz hîlakim, azîz hîlakim
wek teyrî zamar, x̄eĺtanî xakim
pēch edem wek mar, tewaw xemnakim
bē bira u bē qewm be tenya u takim
derdim karye, bē yarim emshew
cergî let u kut, zamarim emshew
nexosh u aciz meh̄zūnim emshew
le Ferhad bedtir Mecnūnim emshew
ezanim wadey axir h̄eyate
qet’eî zîndegî ŕūy ser bîsate
ax yaran le kwēn? bochî bē dengin?
bo nayen bo lam? eĺbet pē lengin?!
hey dad hey bē dad, kwanē yaranim
kwanē birakey carî caranim
weten! kwa nesîm etramēzeket?
kwa xak u xashak enber bēzeket
bē qewm u eshret be bē bira xom
bē hawderdî diĺ, pisht u pena xom
(Qanē’e) be kirdey cherxî chep gerde
chen hezar wek to, henase serde ?

## 13.3 Min u nan

ey nan ! bo toye sheŕî birayî
ey nan ! bo toye ajawle u cyayî

bo toye, bira , bira ekujē
le ŕuy meydana, mēshkî epijē

* * **

bo toye, dinya, kewte gîr u dad
bo toye, tora, dayik le ewlad
bo toye, bawik firzend der eka
kuŕî xoy duchar sed xeter eka
bo toye cerde ŕēge qet'e eka
ŕēgey hat u chū, le 'eam men'e eka
bo toye awsē, le awsē zîze
mashela , shiklit chende temîze !!
to her ew nanî, chen hezar fela
bo to damawe u , kewte helwela
kūŕey zîkrî shēx, bo toye ey nan
zamî dil bo to be soye ey nan
hewl u teqelay pasha bo toye
abiŕū chūnî geda bo toye
asinger, bo to pîk eweshēnē
qari'e bo toye areq eŕijēnē
her kes nanî bū îmanî heye
ŕū sūrî meclîs dîwanî heye
ŕēwî nanî bē shērē tewawe
shēr nanî nebē pishtî shikawe ?

## 13.4 Berî yekētî

ashina, were, ba ashina bîn
le ashna chaktir, her wek bira bîn
net bîstwe bira , le pisht bira bē
meger muqeder, le lay xwa bē
komelî ŕēwî shēr eshikēnin
polî choleke, baz eŕifēnin
tenha penceyek hîchî pē nakirē
ke kirdit be pēnc kē bergey egirē

mishtekoĺ ebē u naw dem eshikēnē
ŕegî bina gwēy dujmin episēnē
ēstesh min u to, ba wek bira bîn
wekū perwane u shu'eley chira bîn
min min u to to , neyenîne kar
gwē nedeyn be qewl, bedî ŕojigar
be diĺēkî pak bo yek xemxwar bîn
bo sūdî yektir dayim hoshyar bîn
ke hat haw xwēn u kuŕîi yek xak bîn
ebē der h̄eq yek bo chî napak bîn ?
tema'e nekeyne namūsî yektir
bo ŕoh̄î yektir, nebîn be agir
baw u bapîrman, wa būnaye zū
ēste îsh ēme le cēye tir bū
semerî weh̄det nebū bo ewan
yekēyan Kurd bū yekēyan Goran
em ser sheqamî ew dergezēnî
dujmin būn be yek dujminî xwēnî
em xeĺqî goyje, ew sabūnkeran
eshîshane yek be sheq tē heĺdan
min men'eyan nakem , zeman weha bū
îxtyar be dest (pyawî beĺa)[13.3] bū
kwēr destkēshē etxate naw chaĺ
tyaya der nayey heta hezar saĺ

## 13.5 Reshbeĺek le cejnî ladēda

kuŕgel wa dîsan ŕojî shadye
bezmî heĺpeŕkē u , diĺ azadye
chirpey gewre kich, ŕū ekate maĺ
araysht eka be lifkey desmaĺ
charekey xamek, ekate koĺî
xiŕxaĺ mechekî cheshnî sehoĺî
milwēnik le mil, lūle le ser diĺ
chaw piŕ le x̄emze, ŕūmet topî guĺ

[13.3] îshareye bo gewrekanî ŕabirdūman

qef qef zulfî ŕesh , pēch u lūl wek mar
tēkeĺ lachenax le ser ta be xwar
birqey berchawe u , kiĺaw zeŕ
egrîcey qirtaw, wek ŕēh̄aney teŕ
wirshey gware gwē, zirîkey lagîr
haŕey piĺpiĺe u , siĺsiĺey zincîr
shortike u kemere , heyaseyî pisht
go yexe ta xwar, cwantirîn le gisht
kewshî Yemenî, ŕewishtî ladē
le heĺpeŕkēda ke her xishpey dē
kewa tozē aĺ, kiras meylew sūr
sirkeyî koĺî birq eda le dūr
suxmey narincî go u deĺek pēwe
le jēr suxmeda, dū shekre sēwe
xaw xaw be wēney, nîmche x̄ezaĺan
dēt bo saratî qeraxî maĺan

* * **

destey herzekar, ŕanik u choxe chak
yek yek ko ebin, wek shērî bē bak
kiĺash hewramî, pestekî bane
pishtēn ketan chin ŕesmî zemane
kewa u pantoĺî le fasonî cwan
feqyaney dū gez exate ser shan
demanche le pisht, fîshek lox̄ le mil
tezbēh̄ kareba tozē denik zil
xencerî deban, kalan tewaw zîw
nexshîn kirawe, em dîw u , ew dîw
dese siŕî aĺ lifkey ber kemer
sūchî dese siŕ, ser mishtūy xencer
kiĺaw grūnî girē chin tewaw
lifke le la shan, mishkî tēkeĺaw
kuŕ u kich lewya tēkeĺaw ebin
hemū bo saray la maĺan echin
ew kiche cwane u ew kuŕe qoze
dēte kaye cejne pîroze

be dem pēkenîn, îshare be chaw
yek bo yektirî aram tya nemaw

* * **

katē zuŕnachî ke eyan bînē
hîch bîr u hoshî le la namēnē
kakey dehoĺkut, dehoĺ le ser diĺ
ew le zuŕnachî, chaktir dēte kuĺ
be bē pē witin sa, tif le gochan
girmey dehoĺî egate asman
zuŕnachî pîqey zuŕna derdēnē
sē car le ser yek pya epîqēnē
pence shil eka emcar le ser kun
dēnēte sema, hezar wekū min
be, bekir begî u fetah̄ pashayî
exate cūĺe tewaw awayî
hendē shore jin ke meylew pîrin
sipî u nerm u shil, qashî penîrin
bîrî zemaney gencî dēte diĺ
eden le mēzer her yek chepkē guĺ
be boney seyro, dēn bo ser shayî
yek le yek tirî mubarekbayî
emca, kich u kuŕ bezmî ŕeshbeĺek
qetar epēkin , des egirin be yek
yek bēwe jinē, teŕ pîrî teŕ posh
tozē chermeĺe u, tewawî diĺ xosh
ser chopi egrē , be lence u lare
kuŕ u kich tēkeĺ, ŕîz be qetare
em shan ew shan, wek kewî piŕ xaĺ
heĺ esūŕenē, pey le pey desmaĺ
kuŕ u kich tēkeĺ dēne ser shadî
eĺēy wer egrin, emrî azadî !!

* * **

sa diĺ bilerzē, sa chaw biŕwanē
sa dem pēkenē, heta etwanē
sa xem heŕa ka, mil xoy bishkēnē
sed hezar qeyser lewya, nanwēnē
mamey ŕîsh sipî dēte ser seyran
her bîr ekato le carî caran
ezanē eme îshî xoy bwe
pîrî u hezar eyb, le destî chew
ke ser chopî kēsh îshwe enwēnē
mameysh bew core, ser ecūĺēnē
sîngî pēy car car eda le zewî
bîr nakatewe le kokey shewî
le naw xeyaĺa weha mes bwe
nazanē axo, dēre yan zwe
kîse tūtinekey der dēnē car car
sebîl tē eka beramber qetar
dūkeĺ le lūtî wek qefî ŕeshmar
pēch pēch dēte der, le ser ta be xwar
bem core bezm u heĺa u heraye
katē ezanin esrew* dwaye
betaĺî eken , echinewe bo maĺ
bo ser îsh u kar, naw maĺ u minaĺ
shabashî chawesh, direm u dînar
da ebarēnin wek hewrî behar
bo tenya ŕojēk wa tekan eden
axo bo cejnî serbestî chî biken ?

## 13.6 Hetîw le ŕojî cejna

cejin, ŕojēke ŕojî shadye
ŕojî seyran u diĺ azadye
ŕojî nîshat u keyf u demaxe
ŕojî seyran u, seyranî baxe
gisht kes be diĺ xosh le naw minaĺî
hemū be meram h̄aĺ u eh̄waĺî
hemū lîbasî taze le ber da
hemū mēzerî shîrîn le ser da

em bo maĺî ew, ew bo maĺî em
esūŕēnewe be bē derd u xem
dem be pēkenîn, diĺ piŕ le sirūr
lîbasî beryan zerd u sewz u sūr
emma bo hetiw, ŕojî zarye
ŕojî gryan u bē qerarye
ne dayik ser u cilî eshorē
ne bawkî heye, bergî bigoŕē
ne parey heye, bîba bo seyran
her wekū baqî destey hawseran
be bē xemxor u, bē pisht u pena
bē pēkenîn u, bē hera u zena
ser kiz u peshēw , le bin dîwaran
aciz u melūl , wek azētbaran
diĺsozî nye des xate shanî
xercî ew ŕoje kate gîrfanî

## 13.7 Sikaĺay Nesrîn lay Qanē’e

selamun eleyk mamey îxtyar
eleke selam kîjoĺey nazdar
mame ! be ashina dēyte pēsh chawim
ŕoĺe gyan ŕenge, min zor geŕawim
bē qeyrî nebēt nawit nazanim
nawim Qanē’e u sheyday nîshtimanim
toy mela Qanē’e ? sha’eîrî hozî !
dayim chaweŕiwan bo berzî kozî ?!
ŕoĺe gyan beĺē , Qanē’eim nawe
bo xom u bo to, cergim sūtawe
mamosta ēme gisht besh xurawîn
beĺam, le ladē tewaw fewtawîn
bîstūme car car, ke nawman ebey
ey bo hawarman tewaw bo nakey ?
eweĺ ta axir, her besh xuraw buyn
le naw komeĺda, ser danewaw buyn
heta minaĺîn zelîl u xwarîn
aciz u melūl, dayim xembarîn
ga, zecr u lēdan ga be ŕūt u qūt

chiĺkin u piĺkin wēney melkemūt
ēme hēshtakū, wayn le dewrî berd
chaw heĺdūrawîn be henasey serd
er biĺēm emshew echime sînema
eĺēn to kichî h̄eyat bo nema
ger biĺēm emŕo echim bo qetar
echim bo geŕan lem shar bo ew shar
hey lem nēr kūrke, ke peyda bwe ?!
abiŕūy shîrînî le des der chew
ya biĺēyn emŕo katî behare
katî seyranî guĺ u guĺzare
nîweŕo dwayē bichîn bo herdan
bo seyrî behar, legeĺ hamferdan
kichē , to kichî, dakewe le maĺ
nabē , bēyte der, be dirējayî saĺ

* * **

eweĺ ta axir, ēme her dîlîn
jyan sūtaw u , zar u zelîlîn
ēme nawērîn biĺēyn însanin
daykî diwa ŕoj, destey lawanîn
h̄isabman biken, bo heĺbijardin
ŕojî întîxab, bo wekîl nardin
her wekū besher pēman bixwēnin
le ser xoŕayî meman ŕencēnin
ēmesh wekū kuŕ, h̄ez le jîn ekeyn
h̄ez le zanîn u tēkoshîn ekeyn !

**Qanē'e:**
kichim be ser chaw , korpey shîrînim
ya xwa be kizî îtir netbînim
hîch xefet mexon , dnya goŕawe
Kurd le xew chawî chak heĺ hēnawe
pētan exwēnin, zor be arezū
be meylî xotan, etan den be shū
le maĺ u mîrat beshtan da enirē

legeĺ kuŕana ferqtan naxirē
îtir xem mexon, nūrî chawanim
ahūy byaban , daykî kuŕanim

## 13.8 Qanē'e u shwan

ŕojē ŕēm kewte ser bendî shaxē
kēwēkî darsan berze demaxē
katîsh chi kate ? katî behare
Kurdistan hemūy cheshnî guĺzare
katî azadî dîlî zistane
seyr u temashay dîde mestane
nizar piŕ le guĺ , guĺî firawan
sewz u sūr u shîn wek diĺî lawan
keres le ser chūz, menē be xerwar
heĺekok zor kok , kashme le naw x̄ar
ŕewas sipî u saf, wēney shūshey zîw
shemaĺ lēy eda, em dîw bo ew dîw
pîchik be yek chiĺ, wek min tenya u tak
ew le say sēber min amētey xak
xuje geĺa lūl, qumam kiĺaw lar
tirîshke u teŕle , hezaran hezar
wenewshe le chem., le pay befrawan
heĺaĺe birme, firmēsk le chawan
ke zanîm dnya tewaw guĺ geshte
chepkey nizaran cheshnî beheshte

* * **

paĺim da be paĺ dar mazūdarē
ŕwanîm ke tik tik etrî ebarē
nwaŕîm le lama hendē h̄eywane
piŕmey mēgek u teqey gochane
dîm, newcwanēk kepenik le ber
gaĺok le mechek, kiĺaw le lay ser

shimshaĺekî zerd le toy pishtēnē
mer chak tēfikrî erna naybînî
merh̄eba xaĺo, chonî kake gyan ?
lewya kewte beyn , Qanē'e u shwan
mame be xēr bēy , xeĺki kam xēĺî
chît le win bwe , bem core wēĺî ?
witim babe gyan diĺim win bwe !
ey to nazanî ke bo kwē chew ?
pēkenî witî: mame diĺ gishtman
esūŕētewe bo deway nîshtman
tozē ŕaweste, bangî bikem bot
bîxemewe naw sîney tengî xot
newî le shimshaĺ le heway (hey diĺ !)
hey diĺ ! hey namerd, hey nazik wek guĺ !
ke pencey cūĺan , her yek hewayē
her yeke dengē, her yek newayē
gwēm girt kewte ser bezm u shorî ney
chopî chemerî, miqamî (wey wey)
ga (mîna mîna) , tawē (tel u bel)
ga (leylî leylî) heway lay mēgel
tawē (xiringeke) , tawē (ay nexshan)
ga (chawe ŕeshē), bezmî (shane u shan)
tawē (sē pēyî), ga heway (lay ŕan)
ga (hey swar hey swar) bezmî ŕuy meydan
ga (sewze sewze) , taw tawē (h̄eyran)
ga (būk u xesū) , bezmî jin hēnan

* * **

xawî kirdewe kirjî demarim
kewtewe bîrim , yarî diĺdarim
kiz kiz boy giryam, ta tewawî kird
zanî peshēwim , shimshaĺî labird ?

## 13.9 Jyanî kich

kichî beste ziman dewrî jyanî
sînemayēke eger bizanî
ke le dayik bū, ahengî nye
eĺēn: ay kiche ! fayîdey chye ?
pē pîrozaney kes bo nahēnē
hîch kes be chake hergîz naydwēnē
piŕ u pîre jin, dewrî daykî eden
her yek be corē diĺxoshî eken
xem mexo, xwa le ser kerem bē
kuŕishit ebē xatirit cem bē
bo îshî naw maĺ, bo hat u choy der
emîsh pēwîste le cēy kareker
sed saĺ nexosh bēt, nabînē derman
le cēy diĺxoshî , her chepok lēdan
nabē nan bixwa ta hemū xēzan
nechēte dwawe, le ser sifrey nan
le pashan emîsh eger netorē
le pashxwan bxwa u , h̄acet bishorē
eger bitorē , hîch kes nazanē
be birsî egrî, heta etwanē

* * **

nabē be dartash, nabē be tucaŕ
nabē be naĺbend, nabē be etar*
eger le h̄ewshe , ser bēnēte der
daykî tēy exuŕē, bē h̄eyay maker !
em beste zimane, heta pazde saĺ
dîl u gîrawe, der nachē le maĺ
katē gewre bū , dēne hat u chū
be lay naxērî kich eden be shū
le kuŕî westa u, bezaz u qesab
dawakarî ebin, le chak u xirap
nîwe efendî u h̄acî jin mirdū
bēchwe xanedan , kon u ŕabirdū
emca dak u bab ekewne tegbîr

gwē naden bewe cwan bē yaxo pîr
temashay eken, her parey zor bē
îtir keyf xoye , ŕesh bē ya bor bē
kichî beste ziman agay lē nye !
nazanē chipey dak u bab chye ?
babî dete cwab, ḣajî zor chake
xawen pareye u , zor zor dił pake
gwē meden bewe , danî nemawe
temenî cwanî tewaw fewtawe
lire u mecîdî le take u cūte
komełî kirdwe , ta arezūte !
katē kich zanî ke eyden be shū
eyden be ḣajî u dnyay le des chū
xuŕ xuŕ firmēskî le chaw dēte xwar
pēch eda le xoy wek marî zamar
ełē hey cwanî ! hey dnyay ŕoshin !
hey dayk u bawik, hey dos u dujmin
hey gewre kichan ! haw ser haw ferdan !
hey besh xurawan, henase serdan !!
bochî komełî ḣimayey ḣeywan
napirsin le ḣal jyanî kichan ?!
er însanîsh nîn , me'elūm ḣeywanîn
bochî bē xemxor le ŕūy cîhanîn ?!
xiwa ḣafîztan azad ken gerdin
wamin ŕekewtim , bo sharî mirdin

## 13.10 Dostî be umēd

dostî be umēd, ŕojî duwane
ewîsh nek be dił , be ser zimane
eger bo tema'e dostî ekey
newełа meyke ! abŕūy xot ebey
sałēkyan min u ashinayēkim
le ashna chaktir, wek birayēkim
bo nef'eî shexsî buyn be ashina
pishtî yekman girt , her wekū bira

min unēd be ew, ew umēd be min
dostman kwēr ekird, chi jyayî dujmin
axirî hîwaman le yek des nekewt
būyn be zîdî yek , wek agir u newt
min newîm le dar , ew newî le berd
herdū xecaĺet, herdūkman ŕeng zerd
her kes aqiĺ be, qet weha naka
bo dostî wa, abŕūy xoy naba

## 13.11 Lay laye

hey laye laye , ŕoĺe lay laye
le kizî Kurdan dengim der naye
ŕoĺey xoshewîst , ciger goshekem
merhemî zamî be peroshekem
wek to perwerdey damēnî minî
bēchwe shērekey xawēnî minî
minîsh le bawesh daykē tira būm
be shîrî ŕastî be xēw kira būm
min ŕasipardey bab u bapîrim
fermūdey ewan her wa le bîrim
ba , bot beyan kem wesētî ewan
bo chi x̄ayeyek , minyan pē geyan
minyan pē geyan , bo xizmetî to
bo be xēw kirdin , bo zeh̄metî to
hey laye laye , ŕoĺe lay laye
shaĺa lay layey gisht kes wa bwaye

* * **

ŕoĺe ! em shire , shîrî shērane
shîrey nî'emetî xakî Kurdane
ŕoĺe ! bēshkeket darî qezwane
nemamî mendey baxî Babane
benî desrazet xurî shekî kaĺ
dabestey kwēstan, chiragay ser yaĺ

awî xwardinewet, kanî (Ceyran)e
chēshtit birincî deshtî (Malwan)e
hey laye laye , ŕoĺe lay laye
xozge toy nîfaq hergîz nebwaye

* * **

shîre ŕastekem nexoy be diro
serserî nebî nemkey ŕencē ŕo
hergîz namūsit be pare nēdy
aweĺ Kurdî xot aware nekey

* * **

ŕoĺe min boye to be xēw ekem
ŕencî damawît legeĺa edem
tosh xizmetkar bî bo gel u hozit
qet qusūr nekey bo berzî kozit ?
hey laye laye, ŕoĺe lay laye
mîletî bē xēw , ŕū le beĺaye

* * **

ŕoĺe ! xayen bî be aw u xakit
dek ecel bigrē damēn u chakit
to be xēw nakem , bo xew u xwardin
ya wek hēndē kes bo chaw shoŕ kirdin
kuŕim ! netbîstwe , meshūrtir le gisht ?
(ser bo ser biŕin, nek bo serzenisht)

* * **

ŕoĺe ! her katē xwēnit biŕijē
be guley dujmin meshkit bipijē
ŕencim h̄eĺalit shîrim noshit bē
kizî Kurdistan feramoshit bē

hey laye laye, ŕoĺe lay laye
komel̂î nezan , wek ka u baye

## 13.12 Goranî shîwen

hamseran derdē, ..........
ser dawe le dil̂, yek giran derdē
ax bo dil̂sozē, dax bo hamferdē
ya yekē wek xom , henase serdē
des keyne mil yek danîshîn be hem
tēkel̂ bikeyn derd , xem le banî xem
min bo ew shîwen , ew bo min zarî
bideyn be serda be bē qerarî
ber pa kayn meclîs zayel̂e u ŕo ŕo
waweyla xeyne seh̄ra u kej u ko
shumshal̂jen ! shil ke pence le ser ney
chopî chemerî miqamî wey wey
derwēsh to dînit berzoke defit
bigre kemey def , be hēzî kefit
lēde le miqam chewashey chepgerd
chepgerd dewran , sah̄eb muhrey nerd
tarchî ! tarmūskit ba rîshey dil̂ bē
miqamē bil̂ē ba dil̂ xecil̂ bē
xosh xwanan bang ken, hel̂kene qetar
ferdî Mewlewî daney gewherbar
temūrey nal̂e u kemanchey giryan
dehol̂î h̄esret , ūdî elfux̄an
her yek le bezmē , her yek le dengē
her yek hewayē , her yek le ŕengē
sa bidene yek , bezmî neqare
aramtan nebē subh̄ u ēware
beshkim sakin bē giŕey derūnim
bibirjēto zam , cergî piŕ xūnim
serim le weswas mîh̄net azad bē
qel̂ay meynetim yekser ber bad bē
satē ser bēnim we banî serîn

bîr dem we kirdar zemaney berîn
yadē kem le h̄aĺ yarî dūr wiĺat
dūr kewtey gerdūn , ŕehendey bîsat
demaxim be bay weten ŕūnak bē
ayeney derūn le xefet pak bē

## 13.13 Ax bo temenî cwanî

tafî cwanî, ............
sermayey nîshat , tafî cwanî
ezîztir le aw cheshmey h̄eywanî
wasitey qanūn , ŕesmî însanî
meta'eî qebūl , parchey piŕ qîmet
tacî ser shahan , nîshaney ŕeh̄met
ta , to le lam būy sah̄îb ŕewac būm
be dem xom nebē , qabîl be tac būm
la jūrū nishîn destey e'eyan būm
zor xoshewîstî destey yaran būm
baĺa ŕēk u ŕast , her wekū chinar
chak u pē kewtū , le ser ta be xwar
chaw wekū dūrbîn , ejno be tekan
henasey serdim , ŕast ŕek u ŕewan
ne kokey derūn , ne hajey beĺx̄em
ne deste lerzē , ne dîdey piŕ tem
ne witwî ŕoj , ne lirxanî shew
ne sîxey ser sing , witwî nēre kew
ne pencey nawik , ne koĺincî shan
ne boĺey minaĺ , bo îsh u firman
ne qebzî meclîs , ne chepokî jin
ne fiĺchey tîke , ne lîk ŕijandin

* * **

## 14 Serchawekan:

[**Q** ] Burhan Qanē'e; Dîwanî Qanē'e, Zankoy Silēmanî, 1979.